The use of pronouns to replace nouns and concepts is common in every language. Since pronouns replace nouns, they are treated under the title of noun in works on language. At the same time, they are considered “mubham” because they conceal names and thus point to a hidden meaning. In Arabic, pronouns are divided into the first person/mutekelim, second person/muḥāṭab and third person/gāib; masculine and feminine in terms of gender; and singular, dual and plural in terms of number. On the other hand, pronouns have many functions. Linking expressions is one of the most important of these functions. In this way, there is no need to repeat the same or many expressions. Another purpose of using pronouns is to eliminate ambiguity and provide clarity in meaning. Apart from this, pronouns are also used for purposes such as reinforcing the meaning, glorification, insult, sarcasm, etc. It is usually clear from the context which name or concept the pronoun refers to. However, this is not the case for all pronouns. In other words, first and second person pronouns generally do not cause ambiguity. Therefore, there is no dispute about this type of pronouns. However, this cannot be said for third person pronouns. Therefore, it is important to identify the person or thing that these pronouns refer to. Therefore, in order for the meaning of a sentence to be clear and properly understood, it is necessary to determine what the pronoun in it indicates. Otherwise, confusion will arise in the meaning of the verse. For this reason, almost all commentators have emphasized this issue. Kurdish translations of some of the verses in which these pronouns appear are problematic. This is often due to the fact that the verses are not translated appropriately into the target language. In this study, we will address this translation problem and present an alternative translation. As an example, the translations of the verses mentioned will be presented in the following two meāl studies, as they are common among the people: The first one is “Qur'ana Pîroz û Wateya wê Ser Zimanê Kurdî” prepared by M. Huseyn Êsî, M. Seid Girdarî and M. Muhemmed Bêrkevanî. The second one is “Sîwana Qur'anê Meala Qur'ana Pîroz” prepared by Abdullah Baykal.

Keywords: Tafsir, Qur'an Meaning, Translation, Pronouns, Criticism.

* Doç. Dr., Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi İlahiyat Fakültesi, hasimozdas@gmail.com Orcid: 0000-0002-4621-435X.

Pirsgirêkên Wergerandin û Zimanî di Wergerandinên Kurdî yên Berhemên Rîsaleyên Nûr de

Nevzat Eminoğlu*

Bedûzeman Seîdê Nursî /Kurdî yek ji alim û zanyarên serdema nûjen a welatê me ye. Di berhemên xwe de ku di demên dawîn ên Împaratoriya Osmanî de ku bi piranî bi Erebi û Kurdî û di salên Komarê de jî bi Tirkî nivîsandine, li hemberî meydan xwendinên ramanî yên Ewropaya nûjen esasên ramana îslamî dihûne û derpêş dike. Di van xebat û berheman de dersa prensîbên têkildarî têkiliyên civak û civatên misilman ên digel hev dide. Herwiha prensîbên nêzîkbûna li hember xeyrîmislimên li derveyî cîhana îslamê û endamên dîn û baweriyên din ên li Ewropa û li cîhanê eşkere dike. Berhemên Bedûzeman Seîdê Nursî/Kurdî ku kulliyateke mezin a bi navê Rîsaleyên Nur pêk tîne, di serî de bi Erebi, Farisî, Kurdî, Îngilîzî û herwiha jî bo zêdetirî 50 zimanên cîhanê hatine wergerandin. Xebata wergerandina berhemên Rîsaleyên Nûr bo Kurdî ku li Tirkiyeyê jî ber zext û qedexeyên li ser kurdî gelek dereng dest pê kirye, di salên 1950î de di nav Kurdên Iraqê de dest pê kir. Xebata wergerandina pirtûkên Rîsaleyên Nûr ên piçûk ên jî bo Kurdî di salên 1990î de ji aliyê weşanên Nûbiharê ve li Tirkiyeyê dest pê kir. Piştî vê dîrokê di destpêka salên 2000î de bi taybetî bi xebatên wergerandin û weşandina berhemên bingehîn ên kulliyata Rîsaleyên Nûr a ji aliyê Weşanxaneya Zehrayê ve lez û bezî bi dest xist. Wihareng wergerandina bi Kurdî ya piraniya kitêbên Rîsale yên Nûr pêk hat. Niha xebatên wergerandina berhemên Rîsaleyên Nûr bo Kurdî jî aliyê hin weşanxaneyên din ve jî tînin kirin. Lê ne bi qasî kar û xebatên Weşanxaneya Zehrayê ne. Eşkere ye ku ev xebata wergerandina Risale yên Nûr a bi Kurdî nixandineke ciddî dixwaze. Di vê lêkolînê de em dê hewl bidin ku di çarçoveya zanista wergerandin û hevoksazî û morfolojiya kurdî de di wergerandinên Kurdî yên berhemên Bedûzeman Saidê Nursî/Kurdî yên bi navê Risale-i Nur de pirsgirêkên wergerandin û zimanî destnîşan bikin û binirxînin.

Bêjeyên sereke: Ziman, Kurdî, Werger, Rîsaleyên Nûr, Seîdê Nursî

* Dr. Öğr. Üyesi, Zanîngeha Muş Alparslanê, Fakulteya Fen Edebiyatê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî, neminoglu@alparslan.edu.tr

Translation and Language Problems in Kurdish Translations of Risale-i Nur Works

Nevzat Eminođlu*

Bediüzaman Said-i Nursi /Kürdî is one of the modern period scholars and thinkers of our country. In his works, which he wrote mostly in Arabic and Kurdish in the last periods of the Ottoman Empire and in Turkish during the Republic years, he deals with the fundamentals of Islamic thought against the intellectual challenges of modern Europe. In these works, while he identifies and teaches the principles regarding the relations of Muslim societies and communities with each other, he also reveals the principles of approach towards non-Muslims outside the Islamic world, and therefore members of other religions and beliefs in Europe and the world. The works of Bediüzaman Said-i Nursî/Kürdî, who constitutes a voluminous corpus called Rîsale-i Nur, have been translated into more than 50 languages of the world, especially Arabic, Persian, Kurdish and English. Translation work of Risale-i Nur works into Kurdish, which started quite late in Turkey due to the pressure and prohibitions on Kurdish, began among Irađi Kurds in the 1950s. The translation work of the small-sized books of Risale-i Nur works into Kurdish, which was initiated by Nûbihar publications in Turkey in the 1990s, gained great momentum, especially with the translation work of the basic works of the Risale-i Nur collection into Kurdish, which was started by Zehra Publishing in the early 2000s. Nowadays, translation works of Risale-i Nur into Kurdish are carried out by some other publishing houses, although not as much as Zehra Publishing. In this study, we will try to evaluate the translation and language problems in the works translated into Kurdish in Bediüzaman Said-i Nursî /Kürdî's work corpus called Risale-i Nur within the framework of translation science and the syntax and morphology of Kurdish.

Keywords: Language, Kurdish, Translation, Risale-i Nur, Said-i Nursi.

* Assistant Professor, Muş Alparslan University, Faculty of Arts and Sciences, Department of Kurdish Language and Literatur, n.eminoglu@alparslan.edu.tr

Kawa û Alaya Wî di Şahnameyên Kurdî de

Shahab Vali*

Lêkolîn û analizên li ser riwayetên mîtolojîk/destanî bi zelalî nîşan didin ku riwayetên navborî li derdora kesayetekî ava dibin ku wekî “leheng” tê binavkirin. Yanî bûyerên vegêranên bi vî rengî li ser kesayetî, jiyana, taybetmendî û serpêhatiyên “leheng” diqewimin. Leheng, kesayetekî sereke, rastîn yan xeyalî ye ku bi cesaret, hêza xwe ya ser-mirovî, li hemberî astengî û xetereyan disekine, ji bo fedakariyê amade ye, têdikoşe, şerî dike û carcaran jî giyanê xwe feda dike. Di vê çaroveyê de çanda Kurdan jî xwedî gelek lehengên cuda ye ku her yek di binhişê kolektîf ê Kurdan de xwedî cîhekî taybetî ye û rengvedana wan bi taybetî di berhemên edebî de dikare bê dîtîn.

Wekî tê zanîn, her neteweyek xwedî riwayetekê ye derbarê “bavê damezrêner” de. Ev riwayet dîroka domdariya neteweyî di nav serdeman de saz dike, nirxên neteweyî vedibêje û şênber dike. Riwayeta damezrêner a Kurdan jî li derdora lehengekî bi navê Kaweyê Hesinkar ava bûye. Ji aliyê teorîk ve Kaweyê Hesinkar ne xwedî wan taybetmendiyên e ku ji bo lehengê tradîsyonel hatine destnîşankirin. Di riwayetên mîtolojîk/destanî yên Kurdan de digel ku Kawa, wekî leheng, tenê di riwayeta serhildana li hemberî Zehak de, di sehneya destana kurdan de cih digire û destpêka jiyana Kawa, malbat, jidayikbûna wî û encama jiyana wî ne diyar e, lê dikare bê gotin ku di binhişê kolektîf ê Kurdan de Kaweyê Hesinkar, wekî lehengekî, xwedî cîhekî cuda û nûwaze ye. Zîra, Kawa, lehengê damezrêner (founding) û bavê hevpar ê Kurdan e. Ji ber yekê jî cihê wî yê navendî di hemû cureyên edebiyata Kurdî de tê dîtîn.

Di edebiyata destanî goranî/hewramî de jî, ku yek ji şaxên herî zengîn ên edebiyata Kurdî ye, Kawa xwedî rolekî girîng e û çîroka wî di nava cureyên cuda yên edebiyata goranî/hewramî, cih digire. Di vê çaroveyê de, armanca sereke ya vê nivîsê hewldanek e li ser nîşandan û alanîza kesayetî, çîrok û serpêhatiyên Kaweyê Hesinkar, wekî leheng û sembola “serhildan/azadî” yê di edebiyata destanî ya goranî/hewramî de.

Bêjeyên sereke: Mîtos, Kawa, Ala, Destan, Edebiyata Goranî.

* Dr. Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Beşa Ziman û Çanda Kurdî.

Kawa and His Flag in Kurdish Shahnames

Shahab Vali*

Research and analysis on mythological/epic narratives clearly show that these narratives are constructed around a character defined as a “hero”. In other words, such narratives are based around the personality, life, characteristics and adventures of the “heroes”. A hero is a real or fictional main character who bravely confronts obstacles and dangers with superhuman strength and is ready to make sacrifices, struggles, fights and sometimes sacrifices his life.

In this context, Kurdish culture has many different heroes, each of whom has a special place in the collective consciousness of Kurds, and their reflection is especially seen in literary works. As it is known, every nation has a “founding father” myth/legend. This narrative establishes the history of national continuity through the ages, defines and embodies national values. The founding narrative of the Kurds is also built around a hero named Kawa the Blacksmith. Theoretically, Kawa the Blacksmith does not have the characteristics defined for a traditional hero. In other words, in the mythological/epic narratives of the Kurds, Kawa appears, as a hero, only in the narrative of rebellion against cruel king Zehak and the beginning of Kawa’s life, his family, his birth and death are not described in the narratives of Kurdish literature. But despite that, Kawa the Blacksmith has a different and special place in the collective memory of the Kurds as a hero. Because, Kawa is accepted as the founding hero and common father of the Kurds. For this reason, it has a central place in every genre of Kurdish literature.

Kawa’s story is also included in different genres of Gorani/Hawrami literature, one of the richest branches of Kurdish literature. In this context, the main purpose of this article is to attempt to show and analyze the personality, story and adventure of Kawa the Blacksmith as a hero and symbol of “rebellion/freedom” in Gorani/Hawrami literature.

Key words: Mythos, Kawa, Flag, Epic, Gorani/Hawrami literatur.

* Dr. Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Beşa Ziman û Çanda Kurdî

Şa'irê Hewramî Ziman û Xwediyê Xemseyê Xanay Qubadî û Berhemên Wî

Semih Gezer*

Xanay Qubadî yek ji şa'irê klasîk ê hewramî ziman e. Ev helbestvan di edebiyata kurdî de bi mesnewiyên xwe tê nasîn. Xana di sed sala 18mîn de li Rojhilatê Kurdistanê hatiye dinê. Ew ji eşîra Cafê ye. Di derbarê jiyannameya wî de gelek hindik agahî gihîştine heta roja me. Wî berhemên xwe bi tevahî bi diyalekta hewramî nivîsîne. Lê wî di nav berhemên xwe de cih dane helbestên 'erebî û farisî jî. Di serdema ku Xanay Qubadî tê de jiyaye desthilatdariya mîrekiya Erdelanê hakim bûye. Di vê serdemê de zaraveya hewramî li rojhilat, di nava eşîr û mîrekiyên kurdan de hevpar bûye. Ji ber vê yekê gelek şa'irên ku ne hewramî ziman bûne jî bi vî zaraveyî helbest nivîsîne. Xanay Qubadî jî bi heman awayî ji bo nivîsê bi cihê diyalekta xwe ya hewramî tercîh kiriye. Xanay Qubadî şa'irekî xwediyê xemse ye di edebiyata kurdî de. Xemseya wî ji van pênc berheman pêk tê; Xusrew û Şêrîn, Leyl û Mecnûn, Yûsif û Zuleyxa, Sultan Îbrahîm û Nûşaferîn û Îskendername. Ji bilî xemseya xwe ev şa'ir xwediyê dîwaneke bi hecm e jî. Xanay Qubadî ji hêla edebî ve bi aweyeke zelal diyar kiriye ku di bin bandora Nîzamiyê Gencewî de maye. Em dê di vê xebata xwe de li ser jiyannameya Xanay Qubadî bisekinin û berhemên wî bidin nasîn.

Bêjeyên Sereke: Xanay Qubadî, Nîzamiyê Gencewî, edebiyata hewramî, xemse, mesnewî.

* Dr. Öğretim Üyesi, Muş Alparslan Üniversitesi, FEF, Kürt Dili ve Edebiyatı, s.gezer@aplarstan.edu.tr

The Poet With Khamsa of Hawrami Dialect: Khanay Ghobadi and His Works

Semih Gezer*

Khanay Ghobadi is one of the classical Kurdish poets and wrote works in the Hawrami dialect of Kurdish. This poet is known for his masnavis in Kurdish literature. Khana was born in eastern Kurdistan in the 18th century. He is from the Jaff (also known as Caf) tribe. However, there is very little information about his life. He wrote all his works in the Hawrami dialect of the Kurdish language. He also included Arabic and Persian poems in his works. During the time of Khanay Ghobadi, the Emirate of Erdelan was dominant. During this period, the Hawrami dialect was the dominant dialect used among Kurdish tribes and emirates. For this reason, many poets wrote in Hawrami dialect even though their native language was not Hawrami. Likewise, Khanay Ghobadi preferred the Hawrami dialect to write poetry instead of his own dialect, the Jaff. Khanay Ghobadi is a poet with khamsa in Kurdish literature. His khamsa consists of the following five masnavis: Khosrow and Shirin, Layla and Majnun, Yusuf and Zulaykha, Eskandarname, Sultan Ebrahim and Noshafarin. Apart from his khamsa, he also has a voluminous divan. Khanay Ghobadi clearly stated that he was influenced by Nizami Ganjavi in literary terms. In this study, the life of Khanay Ghobadi will be discussed along with his works.

Key words: Khanay Ghobadi, Nizami Ganjavi, Hawrami Literature, Khamsa, Masnavi.

* Dr., Mus Alparslan University, Faculty of Science and Literature, Department of Kurdish Language and Literature, s.gezer@aplarstan.edu.tr

Şêx Hesîb Aqtepî û Dîwana Wî

M. Zahir Ertekin*

Aqtepe piştî hilweşîna mîrektiyên kurdan hem ji aliyê ilmî û tesewifî, hem jî ji aliyê edebiyata kurdî bûye navendeke giring. Şair û alimên malbata Aqtepî bandor li gelek edîbên piştî xwe kirine. Ev navend, digel berhemdariya xwe ya ilmî û edebî, wekî şaxeke Xalidîtiyê jî di nav gel de bi têra xwe bi bandor bûye. Li gorî xebatên ku hatine kirin heta niha ji heman malbatê heft kesan berhem nivîsandine û pênc ji wan; digel farisî, tirkî û erebî, bi kurdî jî berhem dane. Şêx Ebdurrehman Aqtepî, wekî danerê vê navenda ilmî û edebî tê qebûlkirin ku ev navend di edebiyata kurdî de wekî ekoleke xasî xwe tê hesibandin. Peyrevên wî, hem yên ji malbatê hem jî yên ji derveyê malbatê, bêguman di bin bandora wî de mane. Şêx Ebdurrehman bi xwe jî zêde di bin bandora Ehmedê Xanî de maye. Îcar, babeta vê lêkolîna berdest Şêx Hesîb e ku yek ji şairên vê ekola giring e. *Dîwana Şêx Hesîb* yek ji wan dîwanan e ku piştî serdema mîrektiyên kurdan hatiye nivîsîn. Şêx Hesîb jî yek ji şairên giring ên vê serdemê ye ku rê û rêça mamê xwe Şêx Ebdurrehman û bavê xwe Şêx Mihemed Can şopandiye. Di vê xebatê de pêşî jiyana Şêx Hesîb hatiye nivîsîn, piştî dîwana wî hatiye nasandin. Herçend kategorîk nebe jî em dê li ser naveroka dîwanê hûr bibin û hewl bidin ku ji aliyê ziman û naverokê ve dîwanê binirxînin.

Bêjeyên sereke: Aqtepe, Şêx Hesîb, Dîwan, Helbest, Klasîk, Keşkol.

* Prof. Dr., Mardin Artuklu Üniversitesi, zahirertekin@hotmail.com

Şêx Hesîb Aqtepî and His Diwan

M. Zahir Ertekin*

After the collapse of the Kurdish emirates, Aktepe, a village in Çınar of Diyarbakir, became an important center not only for science and Sufism but also for Kurdish literature. The esteemed poets and scholars of the Aktepe lineage influenced the works of subsequent authors. Beyond its notable scientific and literary output, this center was very influential among the people, serving as a bastion for disseminating Khalidiyya, a distinguished branch of the Naqshbandiyya order. According to the studies conducted so far, seven members of the same family wrote works in Arabic, Persian and Turkish, with five among them contributing to Kurdish literature. Sheikh Abdurrahman Aktepe is considered the founder of this literary center, which is considered a special school in Kurdish literature. His legacy resonated deeply, not only within his familial lineage but also reverberated beyond it. Sheikh Abdurrahman's own literary journey was profoundly shaped by the influence of Ehmedê Xanî. Our study focuses on Sheikh Hasib, one of the poets of this important literary tradition. Sheikh Hasib's diwan is one of the diwans written in the post-Kurdish emirates era. Sheikh Hasib is one of the important poets of this period, following in the footsteps of his uncle Sheikh Abdurrahman and his father Sheikh Muhammad Can. In this study, firstly the biographical information about Sheikh Hasib is presented and then his Kurdish Diwan is introduced. Subsequently, we will also attempt to evaluate Sheikh Hasib's Diwan in terms of language and content.

Keywords: Aktepe, Şêx Hesîb, Dîwan, Poetry, Kurdish Literature.

* Prof. Dr., Mardin Artuklu University, zahirertekin@hotmail.com

Peyrevê Melayê Cizîrî: Şêxê Meczûb û Dîwana Wî ya Kurdî*

Mesut Arslan**

Şêxê Meczûb, bi navê xwe yê rastî Mihemed Seîd (m. 1915) an jî bi navê mizgefta ku lê veşartiyê Seîdê Merhûm ji Cizîrê helbestvanekî sofî ye ku di serdema dawîn a Dewleta Osmanî de jiyaye û bi zimanê Kurdî helbestên klasîk nivîsandiye. Şêxê Meczûb, bi Kurdî dîwaneke pir bihecm û murettêb li pey xwe hiştiye. Li gorî lêkolîna me dîwana wî di nav dîwanên Kurdî yên serdema Osmanî de ya herî bihecm e û ji 3060 beyt, 73 bend û yek misraê azade pêk tê. Dîwana wî di dîroka edebiyata Kurdî de dikeve nav ekola Xalidîtiyê, ji ber ku ew murîdê Şah Husameddînê Tewlî (m. 1939) ye û bandora murşîdê wî di dîwana wî de eşkere xuya dike. Helbestvanê Kurdî ku herî zêde bandor li Şêxê Meczûb kiriye Melayê Cizîrî (m. 1640) ye. Melayê Cizîrî yek ji helbestvanên pêşeng ên edebiyata Kurdî ya klasîk e. Dîwana wî di nav Kurdan de pir belav e. Piştî Melayê Cizîrî helbestvanên ku bi Kurdî (Kurmancî) helbestên klasîk nivîsandine û di bin bandora wî de nemane pir kêr in. Şêx Meczûb jî hem ji aliyê şêwaz û hem jî ji aliyê rûxsarê ve gelek di bin bandora Melayê Cizîrî de maye. Herwiha ew ji aliyê têgihîştina tesewufî ve jî peyrevê Melayê Cizîrî ye. Di vê pêşkêşê de em dê pêşî behsa jiyana Şêxê Meczûb û dîwana wî ya Kurdî bikin. Piştî em dê li ser Melayê Cizîrî, ku di wêjeya Kurdî de damezrînerê ekola Cizîrê ye, lêkolîn bikin. Em dê bi rêbaza edebiyata berawirdî hewl bidin ku hevşibiyên van her du helbestvanan derxin holê.

Bêjeyên Sereke: Şêxê Meczûb, Melayê Cizîrî, Helbesta Kurdî ya klasîk, Cizîr.

* Ev pêşkêş ji teza me ya doktorayê hatiye hilberîn. Bnr. Arslan, M. (2021). Şeyh-i Meczûb Divanı (Metin-İnceleme). Zanîngeha Dicle, Diyarbakir.

** Dr, Zanîngeha Mardin Artukluyê, mesutarслан@artuklu.edu.tr.

Follower of the Mullah Jazari: Sheikh-e Majzoub and His Kurdish Divan*

Mesut Arslan**

Sheikh-e Majzoub, real name Muhammed Said (d. 1915), or Said-i Merhum, as the mosque where his tomb is located is called, was a sufi poet from Cizre who lived during the last period of the Ottoman Empire and wrote Kurdish poetry in the classical style. Sheikh-e Majzoub, left behind a voluminous and complete Kurdish divan. According to our analysis, the Divan of Sheikh-e Majzoub is the most voluminous among the Kurdish divans of the Ottoman period. The divan consists of 3060 couplets, 73 bends and one detached line. Sheikh-e Majzoub's Divan belongs to the Khalidism sufi movements in the history of Kurdish literature. This is because Sheikh-e Majzoub was a disciple of Shah Husameddin al-Tawilî (d. 1939) and this had a significant influence on his understanding of poetry. The Kurdish poet that Sheikh-e Majzoub was most influenced by was Mullah Ahmad al-Jazari. Mullah al-Jazari (d. 1640) is one of the leading poets of classical Kurdish literature. His divan is very popular among Kurds. After Mullah al-Jazari, there are very few poets who wrote classical poetry in Kurdish and were not influenced by him. Sheikh-e Majzoub was also very influenced by Mullah Jazari, both in terms of style and form. He is also a follower of Mullah Jazari in terms of sufism. In this presentation, we will first examine the life of Sheikh-e Majzoub and his Kurdish divan. Then we will talk about Mullah Jazari, the founder of the Jazira ecole in Kurdish literature. We will try to reveal the similarities between these two poets through comparative literature.

Keywords: Mullah Jazari, Sheikh-e Majzoub, Classical Kurdish poem, Jazira.

* This paper is based on our doctoral thesis: Arslan, M. (2021). Şeyh-i Meczûb Divanı (Metin-İnceleme). Dicle University, Diyarbakir.
** Ph.D., Mardin Artuklu University, mesutarslan@artuklu.edu.tr

Unsûrên Tesewifî di Dîwana Ehmedê Xanî da

Önder Beyter*

Tesewif şaxek ji şaxên ilmên dînî ye ku xwedan gelek reng, deng û pênaseyan e û di xwe da disîplîneke resen û gelek rêbazan dihevine. Tesewifa ku di sedsala 8an da di nav civakên Îslamê da bişkiviye, gav bi gav geş bûye û şax vedaye. Herwisa di nav heyamên dîrokê da tesîr li edebiyatê jî kiriye ku wasîteya xweifadekirina însanan e. Tesewif digel Quran, hedîs, qise û mucizeyên pêxemberan û herwiha tarîx û esatîrê bûye yek ji jêderên edebiyata klasîk. Şairên ku helbest nivîsîne û dîwan tertîb kirine, carinan rasterast carinan bi rêya ciwankariyan sûd ji termînolojiya tesewifî wergirtine. Îca xebat û lêkolînên ku îro roj tîn kirin, hewl didin ku vê sûd û tesîrê tesbît bikin û raxin ber çavan.

Di warê Edebiyata Kurdî ya klasîk da yek ji şairên herî rêçdar Ehmedê Xanî ye. Xanî di sedsala 18an da li Bazîda ku wê hingê derdoreke xurt a Edebiyata Kurdî bû jiyaye û berhem li dû xwe hiştine. Dema meriv li berhemên Ehmedê Xanî dinihêre, tesîra tesewifê xwe dide dest. Lewma jî di vê xebatê da unsûrên tesewifî yên di Dîwana Ehmedê Xanî da ya piştî mirina wî hatiye tertîbkirin, ji hêla sernavên wekî têgehên tesewifî, tîpên tesewifî, mecazên tesewifî, mitesewif û êkolên tesewifî hatine lêkolînkirin. Bi vî awayî hewl hatiye dayîn ku ew yek bê tesbîtîkirin ka Xanî çî qas di bin tesîra tesewifê da maye û vê yekê di çî astê da xwe di helbesta wî da daye der û çî derfet û kûrahiya wateyê daye helbestên wî.

Bêjeyên sereke: Edebiyata Kurdî ya klasîk, Ehmedê Xanî, dîwan, tesewif, unsûrên tesewifî.

* Xwendekarê Doktorayê, Zanîngeha Bîngolê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî, beyter1990@hotmail.com

Sufi Elements in Ahmad Khani's Divan

Önder Beyter*

Sufism is a branch of religious sciences that has many colors, sounds and definitions, and it also contains a unique discipline and many methods. Sufism which emerged in Islamic societies in the 8th century, gradually grew and branched out. In the same way, in the course of history, it has influenced the literature that is the means of self-expression of people. Sufism has become one of the sources of classical literature along with the Qur'an, hadiths, stories and miracles of the prophets, as well as history and mythology. The poets who wrote poetry and selected their best poems for their divan, benefited from the terminology of sufism, sometimes directly and sometimes through literary arts. The work and studies that are being done today are trying to identify and highlight this benefit and effect.

One of the most influential poets in the field of classical Kurdish literature is Ahmad Khani. Khani lived in Bazid in the 18th century, which was a strong area of Kurdish literature at that time, and left works behind. When we look at the works of Ahmad Khani, we also see the influence of sufism. Therefore, in this study, the Sufi elements in Ahmad Khani's divan which was collect and published after his death, has been examined in terms of titles such as sufi terms, sufi types, sufi metaphors, sufi masters and sufi schools. Thus, it was tried to determine to what extent Khani was influenced by Sufism, what extent this situation was expressed in his divan and what depth of meaning it provided to his poems.

Keywords: Kurdish classical literature, Ahmad Khani, divan, sufism, sufi elements.

* Xwendekarê Doktorayê, Zanîngeha Bîngolê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî,
beyter1990@hotmail.com

Mekan û Leheng di Mesnewîya Mem û Zînê ya Ehmedê Xanî û Destana Memê Alan de

Volkan Korkmaz*

Mekan, yek ji hêmanên sereke yên berhemana e. Ji bo gelek armancan di berhemana de cih digire. Çi di berhemên devkî çi yên nivîskî de bi rêya mekanaan tiştên ku tên vegotin tên şenberkirin û bêhtir nêzikî jiyana rastî dibin. Di berhemana de mekane derveyî û yên hundirîn hene ku amaje bi statû û payeya lehengan dikin û di heman demê de dibin alîkar ku tîpên di berhemana de çêtir bîn nîrxandin. Leheng jî yek ji hêmanên sereke yên berhemana e û di jîngeha xwe de anku di mekanaan de ava dibin. Di avakirina lehengan de li gor tradîsyona nivîsandinê ya wê demê, hem di berhemên klasîk de hem jî di yên devkî de leheng, di nav prosesa rûdanên berhemê de li ser dualîteya başî û xirabîyê radibin. Di van cureyên berhemana de lehengên baş jî bo çêtir bîn îdealîzekirin aliyên wan ên baş tên pirolekirin û lehengên xirab jî zêdetir jî bo xurtkirin û meşrûkirina lehengên baş derdikevin pêş. Di vê gotarê de yek ji berhemên klasîk a kurdî Mem û Zîna Ehmedê Xanî û yek ji berhemên edebîyata kurdî ya gelêrî destana Memê Alan jî aliyê mekan û lehengên xwe ve hatine analîzkirin. Herçiqa iskeletên van her du berhemana kêm zêde wekî hev bin jî digel leheng û mekane hevpar ên cuda jî di van berhemana de hene. Leheng û mekane wekî hev jî ji ber ku her du berhem ne ji heman ekolê ne, carinan bi awayên cuda hatine şayesandin. Di gotarê de leheng û mekane van berhemana hatine nasandin û analîzkirin, di heman demê de manendî û cudatîya wan hatine tesbîtkirin. Ji aliyekî ve bi giştî tîpolojîya lehengan hatiye derxistin û berawirdîya wan hatiye kirin ku ev, lehengên berîya modernîzmê ne; ji aliyê din li gor nerîta kurdan fonksiyona lehengên jin ên di van berhemana de hatine şirovekirin. Di heman demê de bi berawirdî mekane her du berhemana hatine nîrxandin bê ka mekane rastî ne yan xeyalî ne û li ku derê ne.

Bêjeyên sereke: Destan, mekan, Memê Alan, Mem û Zîn, mesnewî.

* Mezûnê Masterê, Zanîngeha Mardîn Artûklûyê, e mail: membedirxan@gmail.com

Space and Hero in Ehmedê Xani's Mem û Zîn Masnavi and Memê Alan Epic

Volkan Korkmaz*

Space is one of the important elements of the works. It can be included in works for many purposes. What is told through space becomes concrete and becomes closer to reality. There are interiors and exteriors in the works, and these indicate the status and position of the characters and also help us evaluate the characters. Characters are also one of the important elements of the works and they exist in their own living spaces, that is, the places where they are located. In the creation of characters, according to the writing tradition of the period, the characters are based on the dualism of good and evil, according to the flow of events in both classical works and oral works. In such works, the good aspects of the characters are exaggerated so that they can be better idealized, and the bad characters are highlighted to strengthen the good characters and make them more legitimate. In this article, Mem û Zîn, one of Ehmedê Xani's classical Kurdish works, and the Memê Alan epic, one of the Kurdish folk literature works, were analyzed in terms of setting and character. Although these two works are similar in structure, they also contain different locations and characters. Even though the setting and characters are the same, the two works are sometimes depicted in different ways because they come from different schools. In this article, the settings and heroes of these two works are introduced and analyzed, and their similarities and differences are also identified. On the one hand, the general typology of the characters was determined and these characters dating back to pre-modernism were compared, and on the other hand, the function of the female characters found in the works according to the Kurdish tradition was interpreted. At the same time, the locations of both works were examined comparatively and where these places were and whether they were real or not were evaluated.

Keywords: Epic, hero, Mem Alan, Mem and Zin, space.

* Master's Degree, Mardin Artuklu University, e-mail: membedirxan@gmail.com

Pesindana Hz. Pêxember di Dîwana Şêx Muşerrefê Xinûkî da

Nesim Sönmez*

Di demajoya edebîyat Kurdî ya klasîk da ji Melayê Cizîrî bigire hetanî Şêx Muşerrefê Xinûkî hinek mijarên esasî hene. Ji wan mijaran yek jî hezkirina ji Hz. Pêxember e. Di edebîyata Kurdî ya klasîk da herî zêde li ser Cenabê Pêxember helbest hatine nivîsîn û hezkirina wî bi sedsalan e bûye mijara helbesta Kurdî. Şêx Muşerrefê Xinûkî yek ji pêşengên Edebîyata Kurdî ya Klasîk a sedsala 20an e. Wî, bi çar zimanî dîwaneka helbestên ku li ser mijarên curbicur hatine nivîsîn li pişt xwe hiştîye. Ji wan mijaran yek jî pesindayîna Hezretî Pêxember e. Mijara teblîxê, di dîwana Şêx Muşerrefê Xinûkî da nirxandina wan helbestan e ku li ser pesindayîna Hz. Pêxember hatine nivîsîn. Di teblîxê da helbestên Şêx Muşerrefî yên ku bi Kurdî hatine nivîsîn û mijara wan hezkirina Hz. Pêxember e, hatine nirxandin. Armanca teblîxê, di sedsala bîstan da li gor helbestên Şêx Muşerrefî tesbîtîkirina asta pêşdaçûyîna edebîyata Kurdî ya tekyayê ye. Bi armanca ku mirov di vê mijarê da bibe xwedan qenaetekî nirxandina wan helbestan muhîm e. Di teblîxê da rêbaza teswîrkirina çawanîyê hatiye bikaranîn û çavkanîyên mijarê bi modela şopandina lîteratûrê hatine berhevkirin. Yek ji encamên vekolînê ew e ku şairî, di helbestên xwe da bi hostatîyek asta wî bilind, pesnê Hz. Pêxember daye û edebîyata Kurdî ya tekyayê gîhandîye qonaxeka biqîmet.

Bêjeyên sereke: Edebîyata Tekyayê, Şêx Muşerrefê Xinûkî, Dîwan, Pesindayîna Hz. Pêxember, Qeside.

* Doç. Dr., Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê, Enstîtûya Zimanên Jîndar, Beşa Ziman û Çanda Kurdî, Van, Türkiye, E mail: nesimsonmez@gmail.com, ORCID: 0000-0002-6315-6075

The Praise of the Prophet Muhammad in the Divan of Şêx Muşerrefê Xinûkî

Nesim Sönmez*

In classical Kurdish literature, from Melayê Cizîrî to Şêx Muşerrefê Xinûkî, there are some fundamental themes. Among these themes, one is the admiration for Prophet Muhammad. In classical Kurdish literature, poems about Prophet Muhammad are among the most prevalent and have been the subject of Kurdish poetry for centuries. Şêx Muşerrefê Xinûkî is one of the pioneers of classical Kurdish literature in the 20th century. He compiled a collection of poems in four languages covering various subjects. One of these subjects is the praise of Prophet Muhammad. The aim of this study is to evaluate the poems in the divan of Şêx Muşerrefê Xinûkî that are written about the praise of Prophet Muhammad. The study focuses on Kurdish poems specifically and evaluates their praise of Prophet Muhammad. The objective is to assess, based on Şêx Muşerref's poems, the level of advancement of Kurdish mystical literature in the twentieth century. The significance lies in appreciating the value of these poems. The methodology involves analyzing authenticity and comparing the thematic aspects with the model of literary presentation. One of the conclusions of the study is that the poet, with a high level of creativity in his poems, has praised Prophet Muhammad, contributing significantly to Kurdish mystical literature.

Keywords: Kurdish Mystical Literature, Şêx Muşerrefê Xinûkî, Divan, Praise of the Prophet Muhammad, Qasida.

* Assoc. Dr., Van Yüzüncü Yıl University, Institute of Living Languages, Department of Kurdish Language and Culture, Van, Turkey, E mail: nesimsonmez@gmail.com, ORCID: 0000-0002-6315-6075

Elîfname di Edebiyata Kur(dî)mancî ya Klasîk de

Numan Yurt*

Elîfname, şêwazeke edebî ye ku li ser bingeha elîfbêya erebî tê sazkirin û helbestvan ji tîpa “elîf”ê heta bi “yê”yê bi şiklên curbicur helbest an menzûmeyên xwe dinivîsin. Şertê nivîsîna elîfnameyê ew e ku helbest an menzûme bi tîpên erebî hatibe nivîsîn. Teşe û cureya edebî çî dibe bila bibe di her form û mijarê de bi şêwaza elîfnameyê helbest an menzûme dikare bê nivîsîn. Hin helbestvan di nav pergala klasîk de bi vegotîneke resen û bikaranîna hin hêmanên hunerî dixwazin ku nêrîneke xweser bi dest bixin. Ev helbestvan bi elîfnameyê hewl didin ku behremendiya xwe ya edebî nîşan bidin, bal bikêşin ser vegotinê û hestên xwe îfade bikin. Taybetmendiyêke din a elîfnameyê jî ji hêla paşxaneyê fikrî ve jî rengvedana sembolîzma herfan e. Mînakên vê şêwazê di qada edebiyata klasîk, tesewifî û gelêrî de tên dîtin.

Di vê xebatê de wek şêwazeke edebî du mînakên elîfnameyê yên edebiyata kurdî ya kurmançî tê vekolan. Mînaka yekem a Siyahpoş e ku di nav mesnewiya xwe ya evîni *Seyfu'l-Milûk û Bedî'ul-Cemalê* de bi teşeya xezelê bi cih kiriye. Mînaka duyem jî ya Şêx Ehmedê Feqîr e ku bi teşeya qit'eyê di *Dîwana wî* de cih digire. Siyahpoş û Feqîr hevçerxên hev in û elîfnameyên wan hem ji hêla rêzkirin û cîbicîkirina tîpan a di nav helbestê de hem jî ji hêla şêwe û mijarê ve dişibihin hev. Her du helbestvanên kurdî di elîfnameyên xwe de ji bo her tîpeke erebî ayeteke Qur'anê bi kar anîne û bi bikaranîna sembolîzma tîpan felsefeya xwe ya tesewifî ango gihîştina wehdetê rave kirine. Di destpêka xebatê de behsa çarçoveya têgehî, tesnîf, taybetmendiyên elîfnameyan û hin mînakên sereke yên edebiyatên din hatîye kirin. Piştî ev her du mînakên elîfnameyê yên edebiyata kurmançî ji hêla şikl û naverokê ve hatine nirxandin. Metnên her du elîfnameyan di dawîya xebatê de cih digire.

Bêjeyên Sereke: Edebiyata Kur(dî)mancî ya Klasîk, Siyahpoş, Şêx Ehmedê Feqîr, şêwaza edebî, elîfname.

* Xwendekarê Doktorayê, MEB, numanyurt1@gmail.com

Elifname in Classical Kurdish (Kurmanji) Literature

Numan Yurt*

Elifname is a literary genre created with the Arabic alphabet and based on the poet writing a poem or verse in various forms from the letter “elif” to the letter “ye”. The condition of elifname is that the poem or verse must be written in the Arabic alphabet. Regardless of the form and literary genre, a poem or verse can be written in the style of elifname in any form and on any subject. Some poets want to achieve an original point of view within the classical system with an unique expression and by using some artistic elements. These poets endeavor to show their literary abilities, draw attention to their narratives and express their feelings with the elifname. Another characteristic of the elifname is the letter symbolism in its intellectual background. Examples of this style can be seen in classical, folk and sufism literature.

This study examines two examples of elifname as a literary genre belonging to the Kurmanji dialect of Classical Kurdish Literature. The first example is Siyahpoş’s poem in the form of ghazal in his love masnavi *Seyfu’l-Milûk û Bedî’ul-Jamal*. The second example is in the form of a stanza in Sheikh Ehmedê Feqîr’s *Dîwan*. Siyahpoş and Feqîr are poets of the same period and their elifnames are similar in terms of the way the letters are arranged and placed in the poem, as well as in terms of style and subject matter. The two Kurdish poets used a verse or a fragment of the Qur’an for each letter in their elifnames, and by using letter symbolism, they expressed their mystical philosophy, that is, the aim of reaching wahdat. In the introduction of the study, the conceptual framework, classification, characteristics and main examples in other literatures are mentioned. Then two examples in Kurmanji literature are evaluated in terms of form and content. The texts of these two elifnames are given at the end of the study.

Keywords: Classical Kurdish (Kurmanji) Literature, Siyahpoş, Sheikh Ehmedê Feqîr, literary style, elifname

* PhD student, MEB, numanyurt1@gmail.com

Medhîyeyeke Mela Ebdilhemîdê Saxnisî (1870–1955)

M. Zana Karak*

Mela Ebdilhemîdê Saxnisî yek ji alimên sedsala 19em û 20em e. Di cihê jidayikbûna wî de îxtîlafek heye û cihê wî ne zelal e. Li gorî hin kesan ew li Xînisa Erziromê û li gorî hin kesan jî ew li Hîzana Bedlîsê ji dayik bûye. Herçiqas cihê jidayikbûna wî ne zelal be jî ji ber ku gelek salan li Saxnisa Çewligê muderîsî kiriye wekî Seyda Ebdulhemîdê Saxnisî yê Bîngolî hatiye naskirin. Çêbûna wî weke 1870ê tê zanîn, wefata wî jî 1955 e û gora wî li Çewligê ye.

Ebdulhemîd pêşî ji bo Quran û dersên destpêkê li ba bavê xwe Mela Huseyîn dest bi xwendinê kiriye. Paşê li medreseya Keleha Xînîsê dersên ilmên cuda ji apê xwe Îsheq Efendî wergirtine. Dîsa ji bo demeke kurt li herêma Kurdistanê Iraqê li ba xizmên xwe ilmên cûrbicûr wergirtine. Demekê li medreseya Şêx Fethullahê Werqanîsî jî maye. Seyda ilmê xwe li Paloyê li ba Şêx Hesênê Neqî yê kurê Şêx Elî Sebîtî tamam kiriye.

Seyda Mela Ebdilhemîd bi salan li gelek deveran ji gelek seydayan ders stendiye û herweha dîsa bi salan di xizmeta ilm û îrfanê de li gelek medrese û bajaran jî ders dane. Gelek feqeyan li ba wî îcazeta ilmê standine. Seyda gava ku Cenga Cihanî ya Yekem qewimîye, li gel malbata xwe û hin şênîyên Xînîsê koçî Semsûrê kiriye û li gundên Arîkent û Hesanan ên bi ser Kolîka Semsûrê ve ne, melatî kiriye.

Di vê xebatê de em dê bi kurtasî li ser jîyana wî û helbesteke wî ya medhê bisekinin. Ev helbest wekî medhîye li ser Şêx Ziyaeddînê Norşînî (Hezret) hatiye nivîsîn. Tê de pesn û medhê Hezret hatiye kirin. Helbest bi teşeya murebbe'ê angû bi çarîneyê hatiye nivîsîn û ji 15 çarîneyan pêk tê. Lêbelê di hin nusxeyan de bendên wê kêm in û ferq di navbera van nusxeyan de hene.

Aîdîyeta vê medhîyeya mijara vê xebatê, heta niha bi awayekî zelal nehatiye zanîn. Lê li gorî lêkolînên me ev medhîye ya Mela Ebdilhemîdê Saxnisî ye. Heta niha me 5 nusxeyên destxet ên vê medhîyeyê tesbît kirin û ew bi dest xistin. Li gorî tesbîten me heta niha li cihekî xebatek rexneyî li ser vê helbestê nehatiye kirin. Em dê li vê derê nusxeyên berdest muqayese bikin û metneke rexneyî ya vê medhîyeyê derxînin holê.

Bêjeyên Sereke: Mela Ebdilhemîdê Saxnisî, Metna Rexneyî, Medhîye, Hezret, Nusxeyên Destxet.

* Derçûyê Lîsansa Bilind. m.zana47@gmail.com (ORCID: 0000-0003-1681-4917).

A Praise of Molla Abdulhamîd Saxnisî (1870–1955)

M. Zana Karak*

Mela Ebdilhemîdê Saxnisî is one of the scholars of the 19th and 20th centuries. There is a dispute about his place of birth and his place is not clear. According to some people, he was born in Khinis, Erzirom and according to others, he was born in Hîzan Bedlîs. Even though his place of birth is not clear, he has been known as Seyyîd Ebdilhemîdê Saxnisî of Bîngolî since he worked as e muderris (madrasa teacher) in Saxnis of province of the Çewlig for many years. His birth year is known as 1870 and his death year is known as 1955 and his grave is in Çewlig.

Mela Ebdilhemîdê Saxnisî firstly started studying the Koran and early lessons with his father Mela Huseyn. Later, he received lessons in different sciences from his uncle Ishaq Efendi at the Khinis Castle madrasa. Again, for a short time in the Kurdistan region of Iraq, he received various sciences from his relatives. He also stayed at Şêx Fethullahê Werqanîsî madrasa for a while. Seyda completed his studies in Palo with Şêx Hesenê Neqî, son of the Sheikh Elî Sebtî.

Seyda Mela Ebdilhemîd has taken lessons from many teachers in many places over the years and has also taught in many madrasahs and cities for many years for the sake of science and knowledge. Many students received permission from him. When the First World War occur, Seyda moved to Semsur along with his family and some residents of Khinis and settled in the villages of Arikent and Hasanan in the Kolik town of Semsur.

In this study, we will briefly talk about his life and his poem which is a praise. This poem was written as an kaside to Şêx Ziyaeddînê Norşînî (Hezret). In this poem, the poet praises Hazrat. The poem is written in quatrains, that is, murabba, and consists of 15 quatrains. However, some clauses are missing in some copies and there are differences between these copies.

Until now, it was not clearly known to whom this praise poem, which is the subject of my study, belonged. But at according to our research, this is the praise of Mela Ebdilhemîdê Saxnisî. Because the environment in which Mela Ebdilhemîd lived was an environment under the influence of the Naqshbandi Khalidi sect, and the person on whom the poem was written is also a sheikh of this sect. So far, we have identified and acquired 5 manuscript copies of this praise poem. According to our findings, no critical work has been done on this poem anywhere. Here we will compare existing copies and uncover a critical text of this eulogy.

Keywords: Mela Abdulhemîd Saxnisî, Critical Text, Eulogy, Hazrat, Manuscripts.

* Derçûyê Lisansa Bilind. m.zana47@gmail.com (ORCID: 0000-0003-1681-4917).

Çand û Împeryalîzma Edward Saîd û Îmkanê Bikaranîna Metodolojiya Wî di Rexneya Edebiyata Kurdî de

Serdar Şengül*

Edward Saîd di kitêba xwe ya *Çand û Împeryalîzmê* de pêkhatina edebiyata modern bi destpêka kolonyalîzm û hikumraniya împeryalîzm re têkildar dike. Îdîaya Saîd ew e ku di peywenda Ewropayî de edebiyatên neteweyî di heman demê de edebiyatên emperatorîyê ne ku hem polîtîkayên kolonyalîzmê meşrû dikin hem jî di afirandina îmajên kolonyal de roleke sereke dilîzin. Ji ber vê yekê, ne tenê nivîsandina berheman lê xwendina wan jî di çarçoweya emperatorîyê de pêk tên.

Ev berhema Saîd di warê edebiyatê de îlham da rexneyên postkolonyal. Lêbelê piraniya xebatan kolonyalîzma Ewropayê û temsîla koloniyên di edebiyatê de wekî mijar hilbijart. Saîd bi xwe nepirsîbe jî pîrsek wiha jî derket: Gelo li dervayê Ewropayê jî edebiyatên neteweyî ketibûn xizmeta dewletan û di afirandina îmajên kolonyal de rolek leyistibûn?

Bi avakirina Komara Tirkiye edebiyat di afirandina nasnameye neteweyî de xwedî cihekî navendî bû. Şerê Tirkiyê li hemberî hezên Ewropayî di romanên serdema destpêkê de mijarên sereke bûn lê di heman demê de temsîlên gelên ne tirk jî di wê edebiyatê de wekî mijar berbelav bûn ku heta niha bi rêkûpeka nehatiye xebitîn.

Xalên bingehîn ên berhema Saîd hem îmkan dide ku em edebiyata tirkî û temsîla kurdan ji perspektîfa rexneya postkolonyal de analîz bikin hem jî ji ber ku Saîd materyalên xwe ji kolonyalîzma Ewropayê girtiye sînoren wî hene û hewcedariyê heye ku bê adaptekin.

Edebiyata tirkî di serî de kurd di warê temsîlên gelên din de pal dide îmajên kolonyal toerî û rexneya edebiyata tirkî di vî warî de bêdeng maye. Ew jî nîşan dide ku rexne û teorî bi temsîlên edebî yên kolonyal re hevrê yên hev bûne û hevûdu temam kirine.

Bêjeyên sereke: emperyalîzm, rexneya edebiyatê, edebiyata kurdî, postkolonyalîzm, temsîl.

* Prof. Dr., Kırşehir Ahi Evran Üniversitesi, serdarsenguls@gmail.com

Edward Said's *Culture and Imperialism* and the Possibility of Applying His Methodology to Kurdish Literary Criticism

Serdar Şengül*

In his book *Culture and Imperialism*, Edward Said links the emergence of modern literature with the beginnings of colonialism and imperialism. Said argues that in the European context, national literatures are also imperial literatures that both legitimize colonial policies and play an important role in the creation of colonial images. Therefore, not only the writing of works but also their reading takes place in the context of empire.

Said's work has inspired postcolonial literary criticism. However, most of these works have focused on European colonialism and the representation of colonies in literature. Although Said did not pose the question himself, the question arose here as well: Did non-European national literatures serve the states and did they play a role in creating colonial images?

With the founding of the Turkish Republic, literature became a central element in the creation of a national identity. Turkey's war against the Europeans was the main theme in the novels of the early period, but at the same time the representation of non-Turkish peoples was widespread in this literature, a subject that had not been properly addressed before.

The main points of Said's work allow us to analyze Turkish literature and the representation of Kurds from the perspective of postcolonial criticism, and since Saeed took his material from European colonialism, it is limited and needs to be adapted.

Turkish literature, especially that of the Kurds, casts a shadow on colonial images in terms of the representation of other peoples, and criticism of Turkish literature has been silent in this regard. It also shows that criticism and theory have accompanied and complemented colonial literary representations.

Keywords: imperialism, literary cirtic, kurdish literature, postcolonialism, representation.

* Prof. Dr., Kırşehir Ahi Evran University, serdarsenguls@gmail.com

Bi Nêrîna Femînîst Nirxandina Temaya Evînê (Di Berhemên Nivîskarên Jin yên Kurd da)

Ilyas Suvağci*

Di edebîyatê da yek ji temayên herî zêde hatîye vegotin evîn e. Ji deqên edebî yên herî kevin heta yên modern ew yek ji temayên sereke ye. Ligel edebîyatê, muzîk, sînema, huner û gelek di qadên din da jî ev bi heman awayî ye. Em di dê di vê lêkolîna xwe da pêşîyê li ser têkilîya nêrîna femînîst û temaya evînê bisekinin ka gelo femînîst temaya evînê çawa dinirxînin, bi demê ra fikirên wan yên li ser evînê çawa hatine guhertin, birastî jî dema jinek dibe evîndar ev rewş li pêşîya azadiya wê her tim astengîyan derdixîne holê yan na. Piştî me rave kir ka gelo çima di edebîyatê da bi taybetî romans û romanên populer yên evînîyê yan jî romantîk behsa têkilîyên jin û mêran dikin û piranî çima jin van romansan û romanên populer dixwînin. Piştî me 14 roman û çîrokên nivîskarên jin yên Kurd (Mizgîn Ronak, Suzan Samanci, Bêwar Brahîm, Jana Seyda, Dilan Şewqî, Rojbîn Özkan, Sevda Kaplan, Gula Almastê, Rojbîn Özkan, Sewda, Kurdiye Irgat, Sultan Yaray, Gülistan Çoban, Kîbar Kristîn Ozbey) di çarçoveya nêrîna femînîzmê da nirxandin. Di van berhemên da temaya evînê têkildarî zayendîtî, veqetîn û jidûrketina evîndaran, xapandin, îxanet û tolhildan, dilsozî, têkilîya di navbera evîn, malbat, civak û bawerîyê da, çavnebarî, dijberî û lihevkerina di navbera evîndaran da, trawma û encamên nebaş yên evînên dilsoj, bandora zarokatîyê li ser têkilîyên evînîyê, xerabîyên mêr li jinan dikin, xerabîyên jin li jinan dikin, jinên li hemberî van serî radikînan, hestên şervanên jin yên evînîyê, têkilîyên evînîyê yên heteroseksuvel û homoseksuvel tînan behskirin. Di van berhemên da piranî behsa têkilîyên evînîyê yên bextreş û nexweser, pir kêman caran evînên efsanewî û utopîk, evîndarên îdealîzekirî, hêza evînê tê vegotin. Carinan di çarçoveya temaya evînê da rexneyên civakî tînan kirin, astengîyên civakî û aborî yên di navbera evîndaran da tînan vegotin carinan li ser hebûniya evînê pirs tînan kirin. Wek encam me dît ku temaya evînê bala nivîskarên jin kişandîye lewma hinekan bi serveyî, hinekan bi hûrgilîyan bi awayên cuda li ser evînê nivîsandine. Ev, fikra “temaya evînê bi taybetî ji aliyê nivîskarên mêr ve tê nivîsandin” pûç derdixîne. Lê helwesta nivîskarên jinên Kurd rasterast ne wek ya nivîskarên xwedîyê berhemên evînîyê yên popûler û romantîk e. Wate, jinek dema berhemên jinên Kurd bixwîne ji xem û kulên xwe yên rojane dûr nakeve. Dijberî vê yekê dibe ku ew li ser têkilîyên xwe yên evînîyê, sedemên astengîyên li pêşîya evîna xwe kûr bifikire.

Bêjeyên Sereke: Femînîzm, Evîn, Jina Kurd, Roman, Çîrok.

* Doç. Dr., Zanîngeha Hekarîyê, ilyassuvagci@hakkari.edu.tr

Evaluation of the Theme of Love According to Feminist View

(In the Works of Kurdish Women Writers)

İlyas Suvağci*

One of the most emphasized topics in literature is love. From the oldest literary texts to modern texts, love is one of the basic themes. Apart from literature; The same situation is seen in music, cinema, art and many other fields. In this research, we tried to explain the following questions; What is the relationship between feminist views and the theme of love, how feminists interpret the theme of love, how their views on this subject change over time; Whether when a woman falls in love, this always hinders her freedom. Then we explained why popular or romantic love novels and romances specifically talk about male and female relationships and why mostly female readers read these books. Next, we evaluated the novels and stories of 14 Kurdish women writers (Mizgîn Ronak, Suzan Samancı, Bêwar Brahîm, Jana Seyda, Dîlan Şewqî, Rojbîn Özkan, Sevda Kaplan, Gula Almastê, Rojbîn Özkan, Sewda, Kurdiye Irgat, Sultan Yaray, Gülistan Çoban, Kîbar Krîstîn Ozbey) according to the relationship between feminist views and love. In these works, the theme of love is discussed in the context of the following topics; sexuality, separation, lovers staying away from each other, deception, betrayal, revenge, volunteerism; the relationship between love, family, society and faith, jealousy, compromise and opposition between lovers, the negative outcome of heartbreaking loves and trauma, the impact of childhood on love relationships, the evils men do to women, the evils women do to themselves, women who resist them, warrior women's love, heterosexual and homosexual love relationships. In these works, mostly; Unhappy and sickly love relationships, very few utopian and legendary loves, idealized loves, and the power of love are described. Sometimes social criticism is made in relation to the theme of love, economic and social obstacles between lovers are explained, and sometimes love is questioned existentially. As a result, the theme of love attracted the attention of Kurdish women writers, so some of them explicitly and some indirectly dealt with love in different aspects. This does not confirm the view that the theme of love was written especially by male writers. However, the attitude of Kurdish women writers is different from that of writers who write romantic and popular love works. So much so that someone who reads the Kurdish women writers whose works are examined here does not get away from their daily concerns, on the contrary, they can think about their own love relationships and the obstacles to love.

Keywords: Feminism, Love, Kurdish Woman, Novel, Story.

* Dr. Hakkari University, ilyassuvagci@hakkari.edu.tr

Sovyet Kürdolojisinde Yezidi Akademisyenler ve Aktivistler

Anjelika Pobedonostseva*

1917 Ekim Devrimi, Kars ve bölgesinde yaşayan halkların tarihinde yeni bir dönem başlattı. Kars bölgesinin elden ele (Rusya İmparatorluğu, Ermenistan Cumhuriyeti, Güneybatı Kafkas Cumhuriyeti, Türkiye Cumhuriyeti) geçişi ile paralel olarak 1917-1921 yılları arasında Yezidi-Kürtler ve diğer milletler ve halkların kendi kaderini belirleme ilkesini benimseyen Sovyet Ermenistan'a göç etmekteydi (örneğin Büyük Mirak ve Küçük Mirak köyleri). Sovyet politikası, SSCB'deki Rus olmayan halkların ulusal kimliğini ve ulusal bilincini sistematik olarak geliştirmeyi amaçlamıştı. Transkafkasya veya Güney Kafkasya Kürtleri geleneksel olarak iki gruba bölünmekteydi: Müslüman Kürtler (hemen hepsi Sünni idi) ve orijinal dinde bulunan Yezidiler. Uzun yıllar süren dini izolasyon ve zulümler nedeniyle Yezidiler, kapalı bir toplum haline gelmiş ve proleter statülerinden dolayı Bolşevikler tarafından yeni bir devrimci ideolojiyi içselleştirebilecek dinamik olarak kabul edilmişti. Karşılıklı Yezidilerin kaderi, 20. yüzyılın başındaki sosyal felaket koşullarında gelişmişti. "Merkez ve çevre» arasındaki köklü ilişkilerin kopması onlara yeni fırsatlar yaratmıştı. Önce Birinci Dünya Savaşı, Kars'ı büyük bir imparatorluğun ücra köşesinden savaş cephesinin önemli bir bölümüne dönüştürdü. Savaştan sonra ise imparatorluğun mirasını kullanan ve evrensel özgürlük söylemine sahip olan yeni iktidar için mevcut geleneksel coğrafyayı tanzim etmek ve sosyal hiyerarşiyi kırmak, aynı zamanda çeşitli marjinalleşmiş azınlıklara dayanmak mantıklıydı. Yezidiler birçok anlamda marjinalleşmiş bir azınlık olarak yeni rejimin siyasi programına uygundu. İşte bu yüzden Kars bölgesinden gelen Yezidi Kürtlerin Sovyet Kürdolojisinde oynadığı rolün dikkate alınması gerekir. Bu rol o kadar büyüktü ki Sovyet Kürdolojisine katkıda bulunan Yezidi faktörü hakkında konuşmak önem arz etmektedir. Farklı özelemler, sosyal kökenler ve yaşam serüvenlerini temsil eden Arab Şamoeviç Şamilov (1897-1978) ve Kanat Kalışeviç Kurdoev (1909-1985), tarafımızca dikkate alınması gereken iki mühim portre olarak seçilmiştir. Arşiv belgelerinden yaptığımız derleme ışığında hem Kürt hem de Transkafkasyalı olan A. Şamilov ve K. Kurdoev'in biyografilerini kullanarak 1916-1941 yılları arasında Rusya'da ulusal azınlıklara karşı uygulanan politikadaki değişimi ve Sovyet-Kürt araştırmalarının evrimini tasvir etmektedir.

Anahtar kelimeler: Yezidi Kürtler, Sovyet Kürdolojisi, Arab Şamoeviç Şamilov (Erebê Şemo), Kanat Kalışeviç Kurdoev (Qanâtê Kurdo).

* Dr. (PhD in History), Öğretim Üyesi, Sankt-Petersburg Devlet Üniversitesi Şarkiyat fakültesi Orta Doğu ülkeleri tarihi bölümü a.pobedonostseva@spbu.ru, apobedonostseva@gmail.com

Yezidi Scholars and Activist in Soviet Kurdish Studies

Angelika Pobedonostseva*

The 1917 Revolution marked the beginning of a new period in the history of Kars and its inhabitants. In parallel with the transfer of the Kars region from hand to hand (the Russian Empire, Armenia, the Southwestern Caucasian Democratic Republic, and the Turkish Republic) in 1917-1921, the Yezidi Kurds, as well as other ethnic groups, were resettled to the territory of Soviet Armenia (e.g., the settlements of Big Mirak and Little Mirak, etc.), where the Soviet policy of people's self-determination applied to them. This policy was aimed at the systematic development of modern national identity and culture of the non-Russian peoples of the USSR. The Kurds of Transcaucasia traditionally consisted of two groups: Muslim Kurds (almost all of them were Sunnis) and Yezidis, who profess their ethnic religion. Because of their prolonged religious isolation and persecution, the Yezidis formed a closed society, which, however, due to the low social "proletarian" status of the Yezidis, was considered by the Bolsheviks as a society more capable of absorbing a new revolutionary ideology. The fate of the Kars Yezidis was shaped by the social cataclysms of the early 20th century. The breaking of the established center-periphery relationship, which came at a terrible price, created new opportunities for them. At first, the war turned Kars from a remote location in a huge empire into an important battlefield of WWI. Then, overcoming the legacy of the empire and promoting the ideas of universal emancipation, the new Soviet government continued to break the established imperial geography and social hierarchy, while relying on a variety of marginalized minorities. The Yezidis, being such a minority, fit into the conceptual constructions of the new government in many ways. It is in this context that the role of the Yezidi Kurds from the Kars region, in the development of Soviet Kurdish studies should be considered. This role was so great that it makes sense to talk about the Yezidis' prominent role in Soviet Kurdish studies and policies. Arab Shamilov (1897-1978) and Kanat Kurdoev (1909-1985), who represent different aspirations, social origins and life paths, were selected as key figures to be studied in this paper. Available archival records make it possible to use the biographies of Shamilov and Kurdoev - as Kurds and as natives of Transcaucasia - to study the evolution of Soviet Kurdish studies, as well as Soviet policy towards national minorities in 1916 - 1941.

Keywords: Yezidi Kurds, Soviet Kurdish Studies, Arab Shamoevich Shamilov (Erebê Şemo), Kanat Kalashevich Kurdoev (Qanatê Kurdo).

* Dr. (PhD in History), Department of History of the Middle East Countries, Faculty of Asian and African Studies, Saint Petersburg State University, a.pobedonostseva@sphu.ru, apobedonostseva@gmail.com

Rola Birayên Mukrîyanî di Geşedana Çanda Kurdî ya Modern da

Zülküf Ergün*

Kesayetîyên pêşeng û ronakbîr di nav hemû miletan da mirovên karîger û girîng in, lê di nav miletên bêpaye û bêdezgeh da rola ronakbîran bêhtir e. Kurd ji wan miletan in ku bê paye û bê dezgeh dikevin sedsala netewetîyê û bê palpiştîya wan rûbirûyê dîyardeya çanda modern dibin. Ji ber vê, barê modernkirina çanda kurdî bi tevahî dikeve ser milên ronakbîran û bi saya ked û têkoşîna wan, xebatên çanda kurdî ya modern geş dibin. Di destpêka Şoreşa Meşrûtiyetê (1905) ya Îranê da Husên Huznî Mukrîyanîyê (1890-1947) ku wê demê 15 salî ye, ji Mehabadê derdikeve û bi mebesta têgihîştin û nasîna serdema xwe dest bi geşteke dinyayê dike. Di maweya deh salan da li çendîn welatên dinyayê digere û di encama zanyarîyên bidestxistî û çavdêriyên xwe da ji Almanyayê çapxaneyekê dikire û vedigere nav qewmê xwe. Li Helebê ji alîyekî ve dest bi çapkirina pirtûkên kurdî dike ji aliyê din ve jî dest bi tomarkirin û nivîsîna dîroka kurdî dike.

Eger dîrok lingekî çanda modern be ziman û edebîyat jî lingekî wê yê din e. Ji bo avakirina vê stûna duyem birayê xwe yê biçûk Gîw Mukrîyanî (1903-1977) tîne cem xwe û ji alîyekî ve wî dide ber xwendinê ji aliyê din ve jî jê ra derfetan çê dike ku li ser zimanê kurdî xebatan bike. Her du bira heta dawîya jîyana xwe, li ser dîrok û zimanê kurdî kar dikin, van xebatên xwe di gel hin xebatên din di çapxaneyên xwe da çap dikin da ku bigihîje ber destê hemû kurdan. Ji bilî derxistina kovarên *Zarî Kurmancî*, *Rûnakî*, *Dengî Gêtiy Taze* û *Hetawê* Husên Huznî li dû xwe 15 pirtûk û namîkeyên li ser dîroka kurdan û Gîw Mukrîyanî jî sê ferhengên kurdî-erebî, ferhengeke kurdî-farisî-erebî-fransî-îngilîzî, ferhengeke kurdî-kurdî, dîrokeke edebîyata kurdî ya duwazdeh bergî û gelek pirtûkên din dihêlin. Em di vê xebatê da di nav mercên wê serdemê da li ser nasandin, nirxandin û girîngîya xebatên van her du birayan radiwestin û cihê wan di nav dîroka çand û edebîyata hevçerx a kurdî da destnîşan dikin.

Bêjeyên sereke: Husên Huznî Mukrîyanî, Gîw Mukrîyanî, çand, ziman, edebîyat, dîrok.

* Doç Dr., Zanîngeha Mardin Artukluyê, Beşa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, zxweshevi@gmail.com, ORCID: 0000-0001-8784-56-36.

The Role of the Mukriyani Brothers in the Development of Modern Kurdish Culture

Zülküf Ergün*

Pioneering and enlightened figures are influential and important people among all nations; But in nations without status and institutional structures, the roles of intellectuals are greater. Kurds, one of these nations, enter the century of nationality without status and institutional structure, and they are faced with the phenomenon of modern culture without the support of these structures. Therefore, intellectuals undertake the task of modernizing Kurdish culture, and thanks to their efforts and efforts, modern Kurdish culture studies develop. Husên Huznî Mukrîyanî (1890-1947), who was 15 years old at the beginning of the Constitutional Revolution (1905) in Iran, went on a world tour to understand and get to know his own period. He traveled to many countries in ten years and as a result of the knowledge and observations he gained, he bought a printing house from Germany and returned to his people. While he started publishing Kurdish books in Aleppo, he also started compiling and writing Kurdish history.

If history is one pillar of modern culture, language and literature are another pillar. For the construction of this second pillar, he took his younger brother Gîw Mukrîyanî (1903-1977) with him, and while educating him, he also provided suitable environments for him to study Kurdish. Both brothers worked on Kurdish history and language until the end of their lives, and they printed these works, along with some other works, in their own printing houses, making them available to the Kurds. In addition to publishing the magazines Zarî Kurmancî, Rûnakî, Dengî Gêtîy Taze and Hetaw, Husên Huznî published 15 books and treatises on Kurdish history, Gîw Mukrîyanî published three Kurdish-Arabic dictionaries, one Kurdish-Persian-French-English dictionary, one Kurdish-Kurdish dictionary, They left behind a twelve-volume History of Kurdish Literature and many other books. In this study, while trying to introduce, evaluate and reveal the importance of the works of these two brothers within the conditions of the period, we also aim to determine the place of these works in the history of contemporary Kurdish culture and literature.

Keywords: Hussein Huzni Mukriyani, Giw Mukriyani, culture, language, literature, history.

* Assoc. Prof. Dr., Mardin Artuklu University, Institute of Living Languages, Department of Kurdish Language and Culture, zxweshevi@gmail.com, ORCID: 0000-0001-8784-56-36.

Vekolînek li ser Serenavên Romanên Kurdî

Ümran Altinkılıç*

Serenav ji paratekstên herî giring ên kitêban in; ji ber ku dema xwîner li kitêbekê dinêrin li gel navê nivîskêr pêşiyê serenavê wê dibînin. Wate danûstendina di navbera kitêbê û xwîneran de bi serenavê wê dest pê dike. Mimkun e xwînerêk bi tenê ji ber serenavê berhemekê dest bi xwendina wê bike yan berevajî vê yekê wê nexwîne. Ne tenê ji bo xwîneran ji bo nivîskaran jî serenav giring in, ji ber vê yekê ye ku gelek caran nivîskar ji bo berhema xwe gelek serenavan disêwirînin û bi zehmetî yekê ji wan hildibijêrin. Lê dema ku mirov li ser korpûseke berheman serenavan binirxîne, ji perspektîfêke din jî giringiya wan êşkere dibe. Serenavên berhemên nivîskarekî, berhemên serdemekê yan berhemên neteweyekê dikarin ji gelek hêlan ve derbarê wan de hin pêşhisîn û pêşzanyariyan bidin. Em dê ji vê riwangehê ve di vê xebatê de serenavên romanên kurdî vekolin. Em dê di vê çarçoveyê de serenavên romanên kurdî polîn bikin, analîz bikin û binirxînin. Di vê çarçoveyê de hin nirxandinên wisa mimkun in: Mirov dibîne ku li gor derbirînen demê, derbirînen cihî di serenavên romanên kurdî de kêman in. Nemaze navên taybetî yên bajar û bajarokên kurdan pir kêman in ku ev yek tîkiliya bipirsgirêk ya kurdan bi axê re destnîşan dike. Kêmbûna navên taybetî yên kesan di serenavên romanên de, amajeyê bi lawazbûna feraseta takekesiyê li nav kurdan dike. Zêdebûna derbirînen li ser siruştê û bûyerên siruştî di serenavên romanên de paşxaneya gundewar a civaka kurd û kêmbûna aîdiyeta bajarvaniyê bi bîr dixê. Zêdebûna derbirînen metaforîk di serenavên romanên de bi seriyekî ji ber wê yekê ye ku gelek nivîskaran berî romanên helbest nivîsîne, bi seriyekî jî karîgeriya çanda devkî li ser nivîskaran nîşan dide. Zêdebûna navên ji folklorê kurdî di serenavên de yekser karîgeriya wê ya li ser romana kurdî nîşan dide. Zêdebûna derbirînen li ser êş û xemê di serenavên de ji aliyekî de amajeyê bi êşên kolektîf ên civakî dike, li aliyekî jî bi ruhê melankolîk ê nivîskaran re tîkildar e. Û her wekî din...

Bêjeyên sereke: Paratekst, Romana Kurdî, Serenavên Romanên Kurdî.

* Arş. Gör. Dr., Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, umranaltinkilic@artuklu.edu.tr

A Study on Kurdish Novel Titles

Ümran Altinkılıç*

Titles are one of the most important paratext of books because the title of a book is the first element that catches the eye along with the author's name. In other words, the communication between a book and its readers starts with the title. A reader may choose to read a book just because of its title or, on the contrary, may not read a book because of its title. The titles of books are important not only for the readers but also for the authors, so an author often designs many titles for his/her book and finds it difficult to choose among them. But when book titles are considered in the context of a corpus of works, they are important in another way. The titles of the works of an author, a period or a nation can give some hunches and foreknowledge about them. This study examines the titles of Kurdish novels in this context. In this framework, it classifies and analyzes the titles of Kurdish novels and makes evaluations in this regard. In this framework, the following evaluations can be made: Spatial expressions in Kurdish novel titles are less than temporal expressions. Especially the proper names of Kurdish settlements are very few, which implies the problematic relationship of Kurds with the land. The scarcity of personal names in the titles of Kurdish novels suggests the weak perception of individuality among Kurds. The frequency of expressions related to nature and natural events in the titles of the novels suggests the rural background of Kurdish society and the weakness of urbanization. The frequency of metaphorical expressions in the titles of Kurdish novels is due, on the one hand, to the fact that novelists wrote poetry before writing novels, and on the other hand, it shows the influence of oral culture on the writers. The abundance of expressions taken from Kurdish folklore shows its direct influence on the novels. The expressions of pain and suffering in the titles of the novels evoke collective suffering on the one hand, and refer to the melancholic moods of the authors on the other. And so on...

Keywords: Paratext, Kurdish Novel, Kurdish Novel Titles.

* Ph.D., Mardin Artuklu University, Institute of Living Languages, Department of Kurdish Language and Culture, umranaltinkilic@artuklu.edu.tr

Vegêraneke Mîtik: Donzdeh Siwariyên Merîwanê

Güneş Kan*

Girêdaneke xurt heye di navbera mîtoloji û folklorê da. Bi vekolîna her du qadan hin zanyarî dikarin bèn bidestxistin derbarê dîroka devkî da. Ji ber hevtêkiliyên wan ên nêzîk gelek caran bêyî destnîşankirina sînoren di navbera wan da mîtoloji yekser wek binbeşeke folklorê hatiye qebûlkin û ji bo nivîsîna vegêraneke dîroka neteweyî çîrokên mîtik û folklorîk bûne serkanî. Ev bêhtir di xebatên neteweperwerên romantîk da berçav e ku hay ji hevtêkiliya xurt a folklor û netewetiyê hebûn û folklor ji bo netewetiyê wek amrazêke îdeolojîk diditin. Ronakbîrên kurd ên destpêka sedesala 20an jî ku hay ji xebatên folklornas û neteweperwerên romantîk hebûn, giringiyeke navendî dane folklorê, pêra jî mîtoloji û dîrokê. Hinek ronakbîrên behskirî, bi berhevkirina materyalên folklorîk, neteweyîkirina mîtos û sembolan xwestine çanda kurdan a dewlemend û dîroka wan a qedîm berçav bikin û nasnameyeke neteweyî ava bikin. Pîremêrdê ku yek ji ronakbîrên wê demê bû, bi hestên neteweyî berhevkariya berhemên folklorê kurdî kiriye û ew ji bo nivîsîna dîrokeke neteweyî kiriye bingeh. Nivîskarî li ser bingeha folklorê kurdî û dîroka devkî çend berhem nivîsandine ku *Donzdeh Siwariyên Merîwanê* (1935) yek ji wan e. Vegêran, destaneke dîrokî ya qehremaniyê ye û li ser şerekî kurd û îraniyan e. Di vegêranê da duwazdeh siwariyên kurd li hember duwazdeh hezar siwariyên Îranê şer dikin û wan têk dibin. Têkbirina hêzeke dêwasa ji aliyê hêzeke piçûk ve, simbolîzma jimara duwazdehan, qehremanên tîkneçûyî û hin hemanên din ên mîtik vegêranê ji rûdaneke dîrokî bêhtir nêzîkî çîrokeke mîtik dike. Tevî vê nivîskarî, vegêran wek rûdaneke heqîqî ya dîrokî veguheztiye. Bi vegêranê Pîremêrd amaje bi dîroka kurdan a qedîm, serdema zêrîn, qehremaniyên ezamet ên kurdan kiriye û ew ji bo çêkirina nasnameya neteweyî, hişmendiya neteweyî û nivîsîna dîrokeke neteweyî kirine amraz. Di vê xebatê da dê bê vekolîn ka tîkiliyeke çawa di navbera folklor, mîtoloji, dîroka neteweyî û netewetiyê da heye û bê nirxandin ku di *Donzdeh Siwariyên Merîwanê* da rûdaneke dîrokî çawa wek mîtosekê hatiye vegêran -yan berevajî mîtosek çawa wek rûdaneke heqîqî ya dîrokî hatiye vegêran-.

Bêjeyên sereke: Folklor, mîtoloji, dîrok, vegêran, *Donzdeh Siwariyên Merîwanê*.

* Dr. Vekoler, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê, Beşa Ziman û Çanda Kurdî, rojxun@hotmail.com.

A Mytic Narrative: Donzdeh Siwariyên Merîwanê

Güneş Kan*

There is a strong connection between mythology and folklore. Some information about oral history can be obtained by analysing both fields. Due to the close relationship between them, mythology is often directly recognised as a subbranch of folklore without pointing out the boundaries between them, and mythic and folkloric stories are seen as a source for national historiography. Such an approach is mostly observed in the works of romantic nationalists who are aware of the strong relationship between folklore and nationalism and see folklore as an ideological tool for nationalism. Aware of the work of romantic nationalists and folklorists, Kurdish intellectuals at the beginning of the 20th century also attached central importance to mythology and history, as well as folklore. By collecting folklore products and nationalising mythos and symbols, some of these intellectuals are aimed to reveal the rich culture and ancient history of the Kurds and to create a national identity. Pîremêrd, one of the intellectuals of the period, with national feelings collected Kurdish folklore products and used them for national historiography. The author has written several works based on Kurdish folklore and oral history, including *Donzdeh Siwariyên Merîwanê (The twelve cavalry of Merîwan)* (1935). The narrative is a historical epic about a war between Kurds and Iranians. In the narrative, twelve Kurdish cavalymen fight against twelve thousand Iranian cavalymen and defeat them. The defeat of a gigantic power by a small one, the symbolism of the number twelve, invincible heroes and other mythical elements bring the narrative closer to a mythical story than a historical event. However, the author describes the narrative as if it were a real historical event. In the narrative, Pîremêrd pointed to the ancient history of the Kurds, the golden age, the glorious heroism of the Kurds, and used them to create a national identity and national consciousness, and to a national historiography. In this study, the relationship between folklore, mythology, national history and nationalism will be examined and how a historical event is told as a mythos -or conversely, how a mythos is told as a real historical event- in *Donzdeh Siwariyên Merîwanê* will be evaluated.

Keywords: Folklore, mythology, history, narrative, Donzdeh Siwariyên Merîwanê.

* Dr. Research Assistant, Mardin Artuklu University, Institute of Languages Living in Turkey, Department of Kurdish Language and Culture, rojxun@hotmail.com.

Lêkolînek Derbarê Sembolîzma Rengan di Helbestên Berken Bereh de

Baver Erişen*

Ji serdemên qedîm bigire heta roja me ji bo civakan reng bûne bingeha peyamdayînê û sembolên çandî. Bi pêşveçûna çand û şaristaniyê re civakan li gorî rastiya jiyana xwe wate û sembolên cihêreng li rengan bar kirine. Van wate û sembolan xwe di warê dîn, bawerî, çand, mîmarî, sêwirandin, huner, wêje û hwd. de nîşan daye. Civakan sembolên rengan di ser tiştên dîtbar û şênber de afirandine. Helbet li gel tiştên dîtbar û şênber di ser tiştên nepen û razber de jî vê rewşê xwe daye der. Sembol û wateyên ku li rengan hatine barkirin li gorî serdem û şert û mercên van serdeman guherîne. Di serdema klasîk de wateya ku li rengê sor hatiye barkirin û di serdema nûjen de wateya ku li rengê sor hatiye barkirin li gora rastiya civakan û çandê kiras guhertiye. Li gel vê yekê di heman demê de sembol û wateyên ku li rengan hatine barkirin li gorî diyardeyên civakan diguhere. Di civakan de ji ber yekbûna çand, dîn, hest û ramanan reng wate û peyamên ku ji bo her kesî derbasdar û heman didin. Lêbelê di huner û wêjeyê de hunermend û helbestvan li gorî hizr û bawerîya xwe sembol û hêmayên resen û serbixwe ji rengan diafirînin. Ango di wêje, huner û şewekariyê de sembola reng li gorî nêrîn û dîtina şexs e. Ji ber ku huner û wêje karekî şexsî ye, pêwîst e hunermend ji bo ji aliyê civakê ve qebûl bibe ji hêza xeyalî îstifade bike û xwe biafirîne. Di vê xebatê de sembola rengan a di helbestê de mijara sereke ye. Mijara nivîsara me lêkolînek derbarê sembolîzma rengan de ye di helbestên Berken Bereh de. Rengên ku bi awayê sembolî ji aliyê helbestvan Berken Bereh ve hatine bikaranîn em dê di çarçoveya rastiya siyasî, civakî, erdnîgarî û çandî de wateyên ku ji aliyê helbestvan ve li van rengan hatine barkirin û peyamên ku xwestiye raçav bike binirxînin.

Bêjeyên sereke: Sembol, Reng, Helbest, Berken Bereh.

* Mezûnê Mastirê, Zanîngeha Mardîn Artuklûyê, ranya_jinda@hotmail.com

A study about the symbolism of colors in the poem 'Berken Bereh'

Baver Erişen*

The ancient roots of colors have become the foundation of communication and cultural symbols for societies until our day. With the advancement of culture and civilization, societies have imbued colors with diverse meanings and symbols relevant to the realities of life they experience. These meanings and symbols are reflected in various fields such as religion, beliefs, culture, architecture, exploration, art, literature, etc. Societies have created symbols of colors on tangible and visible objects. Certainly, this situation also applies to intangible and abstract concepts. The meanings and symbols attributed to colors have changed over time and conditions of those eras. For instance, the meaning attributed to the color red in the classical era and the meaning attributed to red in the modern era have changed according to the realities of societies and culture. Along with this, the meanings and symbols attributed to colors change according to societal phenomena. Due to the unity of culture, religion, emotions, and thoughts in societies, color gives universally understandable and identical messages and meanings to everyone. However, in art and literature, artists and poets create original and personal symbols and meanings from colors according to their own sensations and beliefs. That is, in literature, art, and fashion, the symbolism of color is according to the perception and viewpoint of the individual. Since art and literature are personal endeavors, for an artist to be accepted by society, they need to use their imagination and express themselves. In this work, the symbolism of colors in poetry is the main topic. Our article is a study about the symbolism of colors in the poems of Berken Bereh. The colors that have been symbolically used by the poet Berken Bereh will be examined within the framework of political, social, geographical, and cultural realities, and we will analyze the meanings attributed by the poet to these colors and the messages they intended to convey.

Keywords: Symbol, color, poetry, Berken Bereh.

* Masters Degree, Mardin Artuklu Universty, ranya_jinda@hotmail.com

Karakter di Romanên Wezîrê Eşo de

Hikmettin Atlî*

Roman, ku yek ji navgîna sereke ya vegotina nûjen e, ji çar sed salî û vir ve (piştî weşandina Don Kişot), mohra xwe li jiyana nûjen ya mirovahîyê xistiye. Ev cureya vegotinê ew çendî bandorê li jiyana civakan kiriye ku nivîskarên romanên û karakterên di romanên wan de ji bo civak û ferdên wê civakê wekî cureyeke nasnameyê kar kirine. Di jiyana nûjen ya civaka kurd de jî ji sed salî û vir ve ev cureya edebî populer bûye û kêr zêde bandorê li civakê kiriye. Serkêşîya vê cureya nivîsê di demên destpêkê de bêtir ji aliyê kurdên kafkasyayê ve hatiye kirin. Romanûsên wekî Erebe Şemo, Elîyê Evdilrehman, Heciyê Cindî û Wezîrê Eşo, mohra xwe li jiyana edebî û civakî ya hemî kurdan xistine. Di nava van romanûsan de cihekî taybet yê Wezîrê Eşo (1934-2015) heye ku em ê di vê vekolînê de bala xwe bidinê. Ew di sala 1934an de li Tiflîsa Gurcistanê hatiye dinyayê û di sala 2015an de li Brukselê çûye ser dilovaniya Xwedê. Hem di jiyana xwe ya civakî de hem jî di serborîya xwe ya nivîsê de kesekî pir alî ye. Nivîskarekî gelekî berhemdar e û di gelekî waran de berhem dane. Wêje, dîrok û wergêrî hin ji vana qadan e. Di nava berhemên wî yên edebî de *Sîber*, *Qirme*, *Tosinê Uşan*, *Hosta Hovannes* û *Îtîbarî* yên herî giring in. Di nava van her pênc berhemên de her dûyên paşîn yanê Hosta Hovannes û *Îtîbarî* wekî roman na lê wekî novel hatine nirxandin. Lewma di vê vekolînê de em ê di nava berhemên wî yên edebî de sê romanên wî ji xwe re bikin armanc û di van romanên wî de bi taybetî li ser karakterên wî bisekinin. Ev roman ev in: *Sîber*, *Qirme* û *Tosinê Uşan*. Karakterên Wezîrê Eşo, divê em bibêjin ku ji karakterên fiktîf bêtir karakterên jiyana rastîn in û wekî ku wê demê di piraniya wêjeya Sovyet û cîhanê de jî serdest bû, bi nêrîna ekola realîzma civakî hatine honandin. Loma roman û karakterên wî di heman demê de wekî sûreteke rastîn in ji dem û devereke diyar ya parçeyê welat.

Bêjeyên sereke: Roman, Karakter, Wezîrê Eşo, Kurd, Kafkasya.

* Dr. Hikmettin Atlî, Zanîngeha Mardin Artuklu, Beşa Ziman û Çanda Kurdî, mail: bedranh@gmail.com

Characters in Wezîrê Eşo's Novels

Hikmettin Atlî*

The novel, which is one of the main means of modern narrative, has left its mark on the modern life of humanity since four hundred years (after the publication of Don Quixote). This type of narrative has affected the lives of the communities so much that the authors of the novels and the characters in their novels have served as a kind of identity for the society and the individuals of that society. In the modern life of the Kurdish society, this literary genre has been popular for a hundred years and has more or less influenced the society. In the early days, this type of writing was mainly written by Caucasian Kurds. Novelists such as Erebe Şemo, Elîyê Evdilrehman, Hecîyê Cindî and Wezîrê Eşo have left their mark on the literary and social life of all Kurds. Among these novels, Wezîrê Eşo (1934-2015) has a special place that we will pay attention to in this review. He was born in Tbilisi, Georgia in 1934 and passed away in Brussels in 2015. He is a versatile person both in his social life and in his writing. He is a very productive writer and has published in many fields. Literature, history and translation are some of these fields. Among his literary works, *Sîber*, *Qirme*, *Tosinê Uşan*, *Hosta Hovannes* and *Îtbarî* are the most important. Among these five works, each of the last two, *Hosta Hovannes* and *Itibari*, have been evaluated not as novels. Therefore, in this review, we will focus on his three novels among his literary works and focus on his characters in these novels. These novels are: *Sîber*, *Qirme* and *Tosinê Uşan*. We must say that the characters of Wezîrê Eşo are more real-life characters than fictional characters, and as it was prevalent in most of the Soviet and world literature at that time, they were honed from the point of view of the school of social realism. Therefore, his novels and characters are also a real image of a certain time and place of a part of the country.

Key Words: Novel, Character, Wezîrê Eşo, Kurd, Caucasia.

* Dr. Hikmettin Atlî, Mardin Artuklu University, Department of Kurdish Language and Culture, mail: bedranh@gmail.com

Romanê Sosine û Gulîzare de Bawerîyê Şarî

İlyas Akman*

Edebîyatê Zazakî de nuştoxanê muhîman ra yew Îlhamî Sertkaya yo. O, dewa Pircane ke girêdayeya Çewlîgî ya ra yo. Çewlîg de bi nameyê Karêr yew mintîqa esta û na mintîqa new dewanê Elewîyan ra yena pê. Pircane zî zereyê Karêr de ya. Semedo ke pîyê Îlhamî Sertkayayî karmend o, şînekey û xorteyê ey benetî Karêr, Kanîreş, Gêxî, Mazgêrd de vêrenî. Hama ke lîse de wendekaro sîyaset rey de eleqedar beno. Serra 1979 de destpêkê malimey keno û yew serra dima wezîfe ra fek verdano û şono koyan. 1982 de şono Ewropa û weyra destpêkê nuştîşî zî keno. Ey Zazakî şîrî, romanî, kayê tîyatroyî nuştî. Edebîyatê Zazakî de xora romanî toy nusîyayî û înan ra hîrê hebî hetê ey ra ameyî nuştîş: *Kılama Şilane* (2007), *Sosine û Gulîzare* (2013), *Şewa Payîzî* (2020). Herçiqaş romanê ey hîna zaf eserê polîtîk bibî zî eseranê ey de bawerîyê şarî zî xo rê ca veynenî. Çunkî nuştox zereyê şarê xo ra xeberî dano û wazeno ke cuyê înan bi hewayo raşt û zelal eks biko. Coka fekê karekteranê ey ra cumleyî ke bawerîya û kulturê înan eks kenî vecînî. Ma şînî romanê *Sosine û Gulîzare* de inohewa nimuneyan biveynî. Mîsale Gulîzare, semedo ke maya aye şîfa biveyna şona zîyara Hesar Babayî. Hesar Baba, benetî şarî de yew şexsîyeto manewî yo û şarê a mintîqayî semedê şîfa veynayîş şonî zîyare ser. Heto bîn de karekterê romanî Mehemed, wextê xo yê leşkerîye de teda veyneno û o wextan de xo erzeno pelanê Xizirî. Vano ke o Gimjim ra yo û murîdê Xizirî yo. Karekterê romanî ra yew zî Hesen o û gama ke xanima ey mirena vano ke wa pepug semedê ey biwano. Çunkî benetî şarî de yew bawerî esta ke pepug timutim semedê derdan waneno. Karekteranê romanî ra Zerîfe û Cemal zî wextanê tengan de pepug rê veng danî. Roman de karekterî, Duzgin Babayî ra zî ardim wazenî. Na xebate de ma heme bawerîyê şarî ke roman de ca genî tesbît û analiz kenî.

Kilit çekuyî: Edebîyatê Zazakî, Îlhamî Sertkaya, Sosine û Gulîzare, bawerîyê şarî.

* Doç. Dr., Ünîversîteya Mardin Artuklu, Fakulteya Edebîyatî, Beşa Ziwan û Edebîyata Kurdî, Mêrdîn, Tirkîya, ilyasakman@artuklu.edu.tr, Orcid: 0000-0003-2146-2100/Visiting Scholar, University of Massachusetts Amherst, Comparative Literature, USA, iakman@umass.edu.

Folk Beliefs in the Novel *Sosine û Gulîzare*

İlyas Akman*

One of the important authors in Zaza literature is Îlhamî Sertkaya. He is from Pircane village in Bingöl. There is a district called Karêr in Bingöl and this district consists of 9 Alewi villages. Pircane is also within Karêr. Since Îlhamî Sertkaya's father was a civil servant, he spent his childhood and youth in Karêr, Karlhova, Kiğı and Mazgirt. He became interested in political issues while he was still a high school student. He started teaching in 1979, but only taught for 1 year and then went to the mountains. Then he went to Europe in 1982 and started writing literary works there. He wrote poems, novels, theater plays in Zazaki. A small number of novels have already been written in Zaza literature, and three of them were written by him: *Kılama Şilane* (2007), *Sosine û Gulîzare* (2013), *Şewa Payîzê* (2020). Although his works are political works, the subject of folk beliefs is included in his works because the author wants to reflect the lives of his people realistically and clearly. To exemplify, the character of the work, Gulîzare, goes to the tomb of Hesar Baba for his mother to be healed. Hesar Baba is a respected person among the people and the people of that region visit his tomb to seek healing. The character Mehemed is treated unfairly during his military service and throws himself into the arms of Hızır, who is believed to exist among the people and from whom help is sought, in those troubled times. He says that he is from Varto and is Hızır's disciple. One of the characters of the novel is Hesen, and when his wife dies, he wants the cuckoo to sing for him. Because according to folk belief, the cuckoo sings constantly for its troubles. Zerîfe and Cemal, two characters in the novel, also call out to the cuckoo when they are in trouble. In the novel, the characters also ask for help from Düzgün Baba. In this study, we will identify and analyze all the folk beliefs in the novel.

Keywords: Zaza Literature, Îlhamî Sertkaya, *Sosine û Gulîzare*, folk beliefs.

* Doç. Dr., Ünîversîteya Mardin Artukluî, Fakulteya Edebîyatî, Beşa Ziwan û Edebîyata Kurdî, Mêrdîn, Tirkîya, ilyasakman@artuklu.edu.tr, Orcid: 0000-0003-2146-2100/Visiting Scholar, University of Massachusetts Amherst, Comparative Literature, USA, iakman@umass.edu.

Romanê Verênî Yê Kirmanckî (Dimilî/Zazakî)

Pınar Yıldız*

Bi çapbîyayîşê *Don Kîşotî* (1605-1615) yê Cervantesî (1547-1616) edebîyatê rojawanî de sey tewirêkê neweyî roman vejîya meydan û no tewiro newe hêdî-hêdî mîyanê edebîyatê rojhelatî de zî vila bî. Labelê mîyanê edebîyatê heme şaran de roman wayîrê heman tarîxê destpêkerdiş û prosesê vilabîyayîşî nîyo. Bîlhesa rojhelat de zîwanê ke wayîrê yew statuyê resmî û wayîrê yew tradîsyonî yê nuşteki yê xurtî û bêmabênî nêbî, înan de destpêkerdişê romanî hîna erey bî û na rewşe hetêk ra zî girêdayeyê şert û mercanê sîyasiyan bî. Na xebate de ma do edebîyatê kurdkî de destpêkerdişê romanê kurdkî (kurmanckî, kirmanckî, sorankî) ser o vinderê. Na babete hetê rexnegir û cigêrayoxan ra çend hetan ra ameya analîz kerdene. Verê cû ma do mefhûmê 'romanê kurdkî' ser o vinderê. Çike edebîyatê kurdkî cografyayêka hîra û parçekerde de, bi alfabeyanê cîyayan (erebî, kirilî, latînî) berhemanê dîyalektanê cîyayan ra werê yeno. Coka wexto ke 'romanê verênî' yê kurdkî vajîyo tîya de meqsed çî yo, ganî na perse biney zelale biba û kontekstêko hîra de bêra fikirîyayene. Mabênê dîyalektanê kurdkî de zî tarîxê destpêkerdiş û prosesê vilabîyayîşê romanî sey tarîx sey pê nîyo. Roman bîlhesa edebîyatê kirmanckî mîyan de destpêkê seserra vîst û yewine de ameyo cerîbnayîş û destpêk de tayê problemê pênaskerdişî vejîyayê meydan. Çike wina aseno ke destpêk de bîlhesa edebîyatê kirmanckî mîyan de tewirê edebî yê sey xatira, bîyografî, roman yewbinî ra abirnayîş zehmet bîyo û coka tayê problemî vejîyayê meydan. Hetêk ra zî seba ke berhemê edebîyatê kirmanckî zî cografyayêka vilakerde de vila biyê seba cigêrayoxan peydakerdiş yan zî tayê berheman ra agahdarbîyayîş zehmet o. Bi agahdarbîyayîşê berhemêk, tespîtkerdişê berhemêk yan zî rexneyêk nê pênaskerdişî eşkenê bêrê bedilnayene. Coka ewro hema ra zî na babete hetê tayê cigêrayoxan ra yena analîzkerdene û rexnekerdene. Berhemê sey *Hotay Serra Usifê Qurzkızı* (1992), *Teresiye Çemçe* (1995), *Dêrsim'ra ve Dare Estene Seyit Riza* (1996) û *Kilama Pepûgî* (2000) hetê cigêrayoxanê cîyayan ra çarçewaya babeta romano verên yê kirmanckî de ameyê rexnekerdene. Ma do nê berheman derûdormeyê elementanê romanî de (mekan, wext, karekter, mûnite) û tewiranê romanî de (romano biyografîk) binirxnê. Reyna ganî bêro îzeh kerdene ke heman rexneyî romanê kurmanckî û sorankî ser o zî virazîyayê. Kurmanckî û sorankî de tarîxê nuştîş û çapkerdişê romanî û tewirê berheman na babete de pênaskerdişêkê zelalî ver de astengîyan ra çend teneyî yê. Çike ewro hema ra zî hîkaye, novela yan zî roman bîyayîşê tayê nê berhemanê destpêkî tespîtkerdiş zehmet o.

Kilîçekuyî: Romanê kirmanckî, romanê verênî yê kirmanckî, romanê dimilî, romanê zazakî, romanê kurdkî.

* Dr. Cigêrayoxe, Unîversîteya Artûklûyî ya Mêrdînî, Enstîtûyê Ziwananê Ganîyan yê Tirkîya, Şaxê Mayzanistê Zîwan û Kulturê Kurdan, estareyildiz@gmail.com

The First Novel Discussions in Kirmancki Literature

Pınar Yıldız*

After the publication of Cervantes' (1547-1616) novel *Don Quixote* (1605-1615), the novel emerged as a new genre in western literature, and this new genre gradually spread within eastern literature. However, in the literature of all nations, the novel does not have the same beginning and spread history and adventure. Within Eastern literature, especially in the literature of languages that do not have an official status and do not have a strong and uninterrupted writing tradition, the beginning of the novel was much later, and this situation is, in a way, closely related to political conditions. In this study, the birth and spread of the novel in Kurdish Literature is examined. This issue has been analyzed and discussed from some perspectives by many critics and researchers. In this study, we will especially try to focus on the concept of 'Kurdish novel'. Because Kurdish Literature consists of works written in different alphabets (Arabic, Cyrillic, Latin) and different dialects (Kurmanji, Sorani, Kirmancki) across a wide and fragmented geography. Therefore, the works that come to mind when 'the first Kurdish novel' is mentioned should be considered in a wider range. The dates of the birth and spread of the novel vary among Kurdish dialects. The novel was tried especially in Kirmancki literature at the beginning of the 21st century, and some definition problems arose at the beginning. Because in the beginning, there were some conceptual problems in distinguishing literary genres such as memoir, biography and novel from each other in Kirmancki's literature. On the other hand, since Kirmanck's works were written and published throughout a dispersed geography, it can often be difficult for today's critics to access or be aware of these works. Therefore, a new criticism written as a result of identifying and accessing a new work causes us to turn our face to these first novel concepts once again. That's why this issue is still examined and criticized within Kurdish Literature today. Works such as *Hotay Serra Usifê Qurzkızı* (1992), *Teresiye Çemçe* (1995), *Dêrsim'ra ve Dare Estene Seyit Riza* (1996), *Kilama Pepûgî* (2000) have been examined and criticized by different critics within the framework of the concept of the first novel in Kirmancki Literature. In this study, these works will be analyzed and criticized on the axis of novel elements (character, plot, space, time) and novel types (biographical novel). Similar criticisms have been made for novels written in Kurmanji and Sorani dialects. The issue, which consists of problems such as differences in the writing and publication history of the novel in both dialects and the inability to clearly define the genres of the works, has been addressed by different critics. Because today, it is still difficult to determine whether some of these first works are stories, novellas or novels as literary genres.

Keywords: Kirmancki Novelism, First Kirmancki novels, Dimili Novelism, Zaza Novelism, Kurdish novel.

* Dr. Research Assistant, Mardin Artuklu University, Institute of Living Languages in Turkey, Department of Kurdish Language and Culture, estareyildiz@gmail.com

Veguhestina Nirxên Çandî di Pirtûkên Zarokan de

Ferhat Çiftçi*

Edebîyata zarokan, di nava huner û edebîyatê de berhem û çalakîyên ji bo zarokan pêk tîne. Bi piranî li ser pirtûkên zarokan berbiçav e. Di pirtûkên zarokan de mijarên cihêreng hene. Her çar karînen ziman wekî xwendin, guhdarîkirin, axaftin û nivîsandin li ser geşedana zarokan, bi vî avayî jî li ser pirtûkên zarokan cîyekî giring digire. Ji xeynî evana nirxandina pirtûkên zarokan bi gelemperî aliyê ziman, mijar û şikl ve jî dabeş dibe. Di pirtûkên zarokan de armanc û veguhestina nirxan di nava mijarên sereke de tên hesabandin. Di edebîyata zarokan de armancên cihêreng hene û veguhestina nirxan jî ji hin hêlan ve mijareke rexneyî ye.

Nirxên çandî di edebîyata zarokan de hertim ji xwe re warekî dîtîye. Hem di demên kevin hem jî yên modern de ji bo nirxên çandî bi mînakên xwe ve diyar e. Nirxên çandî, ne tenê di nav huner û edebîyatê de, di nava jiyane de jî hertim xuya ye. Ji xuyabûnê zêdetir dikare bê gotin ku sazîkirina jiyane bi destên nirxên çandî tê pêkanîn. Ji xwe çand, bi terza jiyane tê nasandin. Lewma jî nirxên çandî di rehendên takekesî û civakî de roleke giring digire. Edebîyata zarokan jî hêlekî ve berdewamîya vê rolê ye ku ev jî li ser berhemên zarokan xwe nîşan dide. Di cureyên hemû edebîyata zarokan de nirxên çandî tên diyarkirin. Cureyên devkî û klasîk wekî lorî, çirok û hwd jî xwe nirxên çandî tên hesabandin. Hem jî aliyê mijar û ziman hem jî şikl ve tê gotin ku evana bi tevayî nirxên çandî ne. Ji xeynî vê yekê di berhemên modern de jî wekî serlêdanek nirxên çandî cih digire. Hin çaran ev xwe di bikarînan neberametnan yan jî metnên sêwirandî de nîşan dide. Ji ber vê yekê di edebîyata zarokan de nirxên çandî xwedî cîyekî berfireh e.

Ev xebat di pirtûkên zarokan de li ser bikarînan nirxên çandî disekine û ji bo vê yekê çend mînak hatine nirxandin. Berhemên gelêrî wekî Mam Rovi, Pîrê û Çûçê, Şengê û Pengê, Pîrê û Dîko, Pîrê û Rovi, Mîrze Miheme û berhemên nû wekî Şêrê Bitenê, Kulîlk (Dîwana Zarok û Ciwanan), Doktor Jîjo mînakên ev xebatî ye. Di heman demê de li ser diyarkirina mînanan hin mijarên rexneyî jî tîne ser ziman. Metnên ku hatine nirxandin nîşan dide ku nirxên çandî jî bo pirtûkên zarokan xwedî roleke giring e.

Bêjeyên sereke: Pirtûkên zarokan, armancên edebîyata zarokan, nirxên çandî, veguhestina nirxên çandî.

* Dr. Öğ. Üyesi, Zanîngeha Alparslanê ya Muşê,
ferhatciftci1@gmail.com/fe.ciftci@alparslan.edu.tr

Transfer of Cultural Values in Children's Books

Ferhat Çiftçi*

Children's literature includes works and activities for children in the field of art and literature. It gains visibility mainly through children's books. There are different topics in children's books. All four language skills such as reading, listening, speaking and writing play an important role in children's development and therefore in children's books. Apart from this, children's book reviews are generally divided into language, subject and form. Transfer of goals and values are the main topics in children's books. There are different purposes in children's literature, and the transfer of value is a critical issue in some respects.

Cultural values have always found a place in children's literature. There are examples of cultural values in both traditional and modern times. Cultural values are always visible, not only in art and literature, but also in life. It can be said that life beyond appearance comes into being through cultural values. Culture itself is defined by lifestyle. Therefore, cultural values play an important role in individual and social dimensions. Children's literature, in a way, continues this role, which is reflected in children's works. Cultural values are evident in every genre of children's literature. Lullaby, fairy tale etc. traditional genres are already considered cultural values. It is considered a cultural value as a whole with its subject, language and form. Apart from this, the use of cultural values is also included in modern works. Sometimes this manifests itself in intertextual uses or fictional texts. For this reason, cultural values have a wide place in children's literature.

This study focused on the use of cultural values in children's books and various examples were evaluated for this purpose. The anonymous works Mam Rovî, Pîrê û Çûçê, Şengê û Pengê, Pîrê û Dîko, Pîrê û Rovî, Mîrze Miheme and the new works Şêrê Bîtenê (Lonely Lion), Kulîlk/Dîwana Zarok û Ciwanan (Flower/Poems for Children and Young People), Doktor Jîjo are examples of this work. At the same time, some critical issues have been brought to the agenda through examples. The texts examined show that cultural values have an important place in children's books.

Keywords: Children's books, purposes of children's literature, cultural values, transfer of cultural values.

* Dr., Mus Alparslan University,
ferhatciftci1@gmail.com/fe.ciftci@alparslan.edu.tr

Teyfûr Bethayî: Derhênerê Derveyî Dîrokê Mayî û Giringiya Sînemaya Wî

Ekrem Yıldız*

Teyfûr Bethayî yek ji derhênerê kurd ê pêşîn e ku li Sineya Rojhilatê Kurdistanê hatiye dinyayê. Bethayî, li gel derhêneriya xwe, çalakvanê siyasî, peykertiraş, nivîskar û wergêr bûye. Wî ji serê salên 1970yî ve dest bi çêkirina hejmareke kurtfilm, belgefilm û filmên dirêj kiriye. Ji ber rewşa serdema wî ya siyasî, zindanîbûn û sirgûnbûna wî ya Ewropayê hindêk filmên wî yên ewil negihîştine roja me û wenda bûne. Herçiqas hindêk filmên wî berdest nebin jî, çendîn filmên wî yên serdema jiyana wî ya dawî gehîştine roja me. Peydabûna van filmên wî yên wekî *Nan û Azadî* (1983) û *Gelegurg* (1990) hem ji bo têgehîştina serdema wî hem jî ji bo dîroka sînemaya kurdî giringiyeke xwe heye. Ji ber nasnameya wî ya çalakvanê siyasî sansûra lêkolînê ya li ser karûbarên wî yên hunerî li Îranê û peydabûn û bidestketina filmên wî yên berbehs destnîşan dikin ku hem sînemaya wî nebûye babeta lêkolîneke tekûl hem jî filmên wî di nav berdewamiya dîroka sînemaya kurdî de nehatine destnîşankirin. Armanca vê lêkolînê ew e ku biyografiyeke hunerî, siyasî û takekesî ya Teyfûr Bethayî pêşkêş bike û naveroka filmên wî yên berdest analîz bike û wan bide nasîn. Belgefilma Bethayî ya bi navê *Nan û Azadî* behsa xîzaniya xelkê Rojhilatê û têkoşan û raperîna salên 1980yî li Rojhilatê Kurdistanê dike. Ji vî aliyê xwe ve ev belgefilm dikare wekî berhemeke bangeşeyî ya kurdî bê binavkîrin. Filma *Gelegurg* jî ji novela nivîskar Hisên Arif ya heman navî, *Gelegurg* hatiye adaptekirin û film dikare wekî yek ji filma ewil a kurdî ya salên 1990î bête qebûlkîrin. Peydabûna van filmên berbehs li ser dîroknivîsiya sînemaya kurdî tesîrekê dike û dikare di nav berdewamiya dîroka sînemaya kurdî de bê destnîşankirin.

Bêjeyên sereke: Sînema, sînemaya kurdî, Teyfûr Bethayî, *Nan û Azadî*, *Gelegurg*.

* Xwendekarê doktorayê, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, e-mail: ekremekoyildiz@gmail.com

Teyfur Bethayi: The Director Out of History and Importance His Cinema

Ekrem Yıldız*

